




BERXWEDAN

BERXWEDAN JÎYAN E

Hejmar 2

Gulan - 1983

Biha : 5 Skr.



BERXWEDAN

Têdayî

Ji Ber Tîrsa Şoresê
3

Bûyer û Nûçe
4-5-6

Dengek Ji Zindanê
7-8

Li Dijî Dijmîn Hêrs û Hemberiya Gel
Kûr Dibe
9-10

18 û 19 ê Gulanê
11

Newroz Bû Pergalê Jiyanê
12

Tiyatro
13-14-15-16

Li Nav Netewa Kurd Tesirên Weje.
Çand û Sin'et
17-18-19-20

Ji Kurdistan'a Başûr
21-22

1 Gulan
23



TİDSKRİFT
BERXWEDAN

Utges av
Kurdiska Demokratiska Riksförbundet

HS Offset

Konto No: 92 16 25 - 0



Berpîrsiyar
MERWAN



BERXWEDAN

Kovara Kurdi

Xwedi: Federasyona
Demokrat ya Komelên Kurd
li Swêd



Navnişan - Adress

c/o Kurdiska Bockafet
David Bagares gat; 12 nb

111 38 Stockholm
SWED

XWENDEVANÊN HÊJA!

Em lê bawerîn ku "BERXWEDAN" bi he-
bûna xwe ji alî xebata weşînî de valahiyek
dagirt.

Bi amanca hêzkirin û pêşxistin û tekûzkirina
"BERXWEDAN"ê ji name û rexnên xwendevanan
xuyane ku ew ê "BERXWEDAN" bi her hejmarekê
ber bi amancê xwe ve bê rawestandî gavan bavê-
je; û baldari alikariya xwendevanên hêja zaftir
bikişî ne.

Lê ne ji hejmarek tenê re, ji bo her hejmarekê
em li benda rexnên xwendevana ne. Lewra; rêya
xwediderketina kovarê ev yek bixwe ye.

Daxwaz û hêviyên me ji xwendevanên hêja
ev e ku; bi hûr-bijari li ser hemû nivîs û per-
galên "BERXWEDAN"ê hevkarî û piştgiirtiyên
xwe bi nexşin.

Bellê, bi rexne û hevkarî em "BERXWEDAN"ê
bikin şaxên dara welathizî, ciha kaniya şores-
gerî.

Rojên hatinê yen me bin!

JÎ BER TÎRSA ŞOREŞÊ!

Di derheqên biryarê cihbûna hêza çeleng de guhartin çebû. Di radyoya Almanya Rojava, weşîna zmanê Tirkî de, M. Alî Birand li ser vê di 19 ê Çile 1983an de diyar dike ku wê di derheqên biryarê cihkirina hêza çeleng de, guhartin çê bibin. Navê hêza çeleng jî tê guhartinê. Û cihê hêza çeleng guhurî ye.

Tê zanin ku ji bo hêza çeleng, li Kurdistan'ê 10 cihê balafirgehan di hate amade kirinê. Ev 10 cihên balafirgehan, li hêllên Kurdistan'ê yên stratejîk dihatin çêkirinê. Mîna hêlla Wan'ê, Mûş'ê hwd. Êşkereye ku, emperyalîzm û sazûmanên zorbaz, li hemberê şoreş û tekoşinên rizgariya gelên Rojhelata-Navin xwe bikar dikin; karbûnên xwe binêz dikin.

Mîna daxûyan dibe, li Waşington'ê dema destpêkê navê Tirkîyê tê daxûyankirinê. Lê, sedemê rewşa Tirkîyê û ji ber dengên alema çihanê dev jî vê yekê berdidin û daxûyanê difetilin, veşartî dihêlin. Li gohra daxûyana nûh, hêllên hêza çeleng firehtir dibin û navê hêza çeleng bi komitaniya giştî tê guhartinê. Wê, hêza eskerî, li Almanya Rojava bicih bikin. Ji ber giraniya hêza eskerî, wê Misir cihgera navça hêzê be.

Sebebên guhartina biryarên derheqê hêza çeleng de gellekin. Dibi ku ev, ji gellek alîyan ve bêne vejnandinê. Ger sedemên guhartinê bêne rêzkirinê bi kurte-biri ev yekin;

a- Ji bo maf û serdestiya xwe ya Rojhelata-Navin, USA hemû rêya di de ber xwe û tevgeran pêk tîne. Van pêkanînan diwar rêya hebûn û domandina xwe dibîne. Lê, mîna dewleta Hollanda, Frensa û hwd. ji ber mafên xwe yê Rojhelata-Navin ray li van pêkanînan tazî naynin. Ji ber vê yekê, ku emperyalîzm USA bi zerpên tazî hilweşandinên bingehî amanc dike, ev hêll û hêllên radîkal û yên Îraq û yê Îran'ê, li hemberê perçiqandina hemû hêza derdikevin!

b- Ji bo parastina mafê USA, û hebûnê wê di Rojhelata-Navin de Tirkîyê, rola xwe bikar bîne, rêya rola wê ya politîkî neqediya ye. Negihîştîye rêya dawiyê. Ji ber vê yekê di vê rewşê de xemlandina Tirkîyê bi hêzeka tazî bi karanîneka baş nayê ditînê.

Di vî warî de, emperyalîzm Rojhe-

lata-Navin rola îslamiyetê jî dide ber çavê xwe. Di têkiliyê van welatan de Tirkîyê jî xwe ra destik dibîne. Û rola Tirkîyê ya di nava konferansa Dewletê Îslamê de pêwîst dibîne. Ji bo ku mafê xwe li ser hêllên Rojhelata-Navin û nexasim jî, li ser Îran û Îraq'ê pêk bîne, hewceyê rola Tirkîyê ye. Pêşveçûnên vê yekê, di têkiliyên -welatên Rojhelata-Navin- yên abûrî, siyasî, eskerî û hwd. de bi zelalî eşkere dibin.



c- Li hêllên Kurdistan'ê cihkirina hêza çeleng, wê li Tirkîyê û li Kurdistan'ê rewşa sazûmana eskerî zelaltir bibe. Û ewê hemberiya gel bikişîne. Ewê rewşa nemirovî li ber gel derkeve meydanê. Şika vê yekê dikin ku wê tégihîştina gel bi kemile û ewê gel ber bi sefê şoreşê ve here. Di rêya şoreşê de ewê gel li hemberê vî pilanê nemirovî derbikeve û ewê xebatên hilweşandina vê yekê bike. Ev ne tenê ji bo hêz û gelên Kurdistan'ê û Tirkîyê, jî bo gelên Rojhelata-Navin jî rast e. Ku ewê di bin gefên giran û zilmên diwar de, şervaniya gelan bikemile. Û ewê li diji vê yekê rawestin. Di Rojhelata-Navin de hatineka bi vî awahi jî bo ku li diji mafê emperyalîzmê ye -ku ew jî vê daxûyan dikin- li van

yeka hûr-hûr diponijîn. Lewra, ji şoreşên gelan ditirsîn...

Êşkereye ku emperyalîzm USA; rewşa çihanê, rewşa Rojhelata-Navin û rewşa welatên emperyalîst, jî bo pêkanîna stratejiyê têt nabîne. Ev şert jî bi dest neketine. Hoyên politîkî negihane wê qeysê ku vê stratejiyê bi firehî pêk bîne. Mîna di berberiya nava Yunanistan û Tirkîyê de xûya dibe, berberiyên nava NATO, tengasiyê paşverûkên Rojhelata-Navin li ber

pêkanîna stratejiyê mîna bend radiwestin. Pêşveçûna hêza sosyalîzmê û pêşveçûna tekoşinên gelan, hêza emperyalîzmê di tengasiyên giran de asê digrin.

Ji alîki ve daxûyana bûye, rastîyekî vedîşere. Lewra; ji bo bikar anîna Tirkîyê, ev rê, herdem vekiriye. Vê dibin çî nava de bikar binin jî, disa rastî jî gelên çihanê nayê veşartinê. Lewra, daxûyana Wezirê Derva Îlter Turkmen vê eşkere dike ku: "jî bo hêza çeleng ne hewceye ku cihên nûh vebibin. Ji bo vê derê bikar binin, ne pêwîste ku biryar bêne sitendinê. Lewra, herdem rêya vê yekê heye". Ne pêwîste gotin bê dirêjkirinê, lewra daxûyan hemû yekan eşkere tîne holê.

Her roj kuştinek eşkere dibe!

Bi hemû destikên heza xwe ya qolonyalist cunta leşkerî li ser gelê me nîrê qolonyalistiyê diwartir dike.

Ji zilm û zorbaziyên bê hed, bi netica zerp û îşkencên hovîtî ku, kuştin û qetliamên nemirovî pêk tên, hewqas gihane wê qeyse ku qolonyalista Tirk, bi destavêtina hemû rê û destikên xwe dişa, nikare wa bineximin e.

Mîna welathizekê Kurdistan daxuyan dike, bi destên heza qolonyalist li Wêranşehîrê di navbera 14.11.1982 û 16.11.1982yê de di bin îşkence û zerpên giran de du welathiz tene kuştinê. Navên van hogirê heza Mehmet Aslan û Îbrahim e. Tê te zanin ku di girtin û seravêtinên gund û bajêran de, bi zilm û zorbaziyên heza qolonyalista gellek xweşmêrên gelê Kurdistanê tene kuştin. Û kuştî demên dirêj nexmandî diminin. Û hê ji gellek kuştin eşkere nebûne. Ji hêllên hepsa ta hêlla

gundî: gellek bûyerên, kuştinê û qetliama veşartî ma ne. Karbidestên faşîst ji ber berxwedan û bûyerên hepsê û ji ber kuştinê hêllên gundî, nas û malîyên girtûyan dixin bin zerp û gefên giran. Li ser van heza eskerî kêm nakin. Dixwazin wan bê deng û bê his bihêlin. Ku kes bi bûyeran ne hise, û bûyer nêne zman. Gellek caran ji, nas û malîyên wana digrin. Û demên dirêj dibin îşkencê giran de wan dihêlin.

Lê, di nava van hemû zerp û zorbazi, îşkence û gefên giran de be ji, dişa bûyer neximandî namînin. Dembidem eşkere dibinû rastî derdikevin meydanê. Lewra, gelê me yê rizgari-xwaz, di nav hoyê dijar da be ji dişa, biryar qetliam, hovîtî û îşkencê karbidestê faşîsta derdixê der. Û ji nemirovî û pêkanînen qolonyalista Tirk, hesabê nemirovî, îşkence û qetliama pirs bike.

CÎVÎNEK LÎ SER ÎŞKENCE Û LÊDANÊ

Di 11 ê Nisan 1983an de li saloneka parlamentoya Swêd, civînek li ser îşkence û pêkanînen nemirovî çê bû. Ji gellek welatên Ewropî berpirsiyar û endamên yekîtîya avukatên û guhdarvan li civînê pêşdar bûn. Çend ji hevalên federasyonê û Av. H. Yildirim di civînê de pêşdar bûn.

Piştî berpirsiyarê Yekîtîya Avukata civînê bi axaftineka dirêj, li ser îşkence û lêdanan vekir pê de, berpirsiyar û endamên komika li ser îşkencê û lêdanan, zerpa li ser avukatên li van welatan, ku karbidestên wan îşkencê ji xwe ra kirine sistemekî, sekinîn. Îşkence û ezîyetên girtixana pêşkêşî civînê kirin. Avukatên endamê Amnestî û temsilkarê Amnestiyê li ser rewşa girtixanan Diyarbekir peyivîn.

Li ser axaftinên wan Av. H. Yildirim bi kurte-birî, serpêhatina xwe daxuyan kir. Û li ser rewşa girtixana Diyarbekir van yekan pêşkêşî civînê kir, «Hemû mafên mirovî li zincîrê hatine girêdanê; dibin îşkencê de ne. Tu heqêki girtûyan tune ye. Mafê parastinê ne berê hebû, ne ji wê bidne wan. Yên ku li hember hovîtî û nemiroviya wan, û li dijî amancên wanê dijmirovî radiwestin. Di nav hemû êş û îşkencan de li hember van sing vedigrin, bi awayên wisa kuştin ku his

û aqilên mirovan nagre. Bi pêkanînen nemirovî mahkemên xwe gihandine qeysa giyotînê. Karbidestên cunta qolonyalist bi van pêkanînen nemirovî poz ji tu tiştêki nakin. Li hemberî hemû mafên mirovî radiwestin. Bi hovîtî û nemirova ya xwe gellek şoreşger û rêberên tekoşîna gelê me Kurdistanê bi hovîtî kuştin. Û hê didomînin. Gellek kuştin û qetliam çêbûn e. Û hê derneketine derwa. Min di jiyana xwe da dit ku, ew ê van xweşmêrên Kurdistanê bi hemû metod, leystik û fena wê dibin îşkence û hoyên girtixanê de bi kujin. Girtî, her ro li ber mirinê ne. Nêzi sed kesa, navê wan ji dikarim eşkere bidim ku wê ro-biro, bere-bere wê wan bikujin û wê eşkere ji dibêjin. Mîna hestîki rût ma ne. Li van pêkanînen qolonyalista Tirk, cunta faşîst tê heyirandinê. Lê ez bawerim ku pêkanînen nemirovî, hovîtîya li ser girtûyên girtixana Diyarbekir pêk tên, anîna zman, têgihîştina van yeka ne mumkin e. Lewra his û mêjû wê hovîtîyê nagre, gotin û zman têr nayên».

Piştî hêvî û diyarkirina daxwazan, giraniya civînê piştigirtina axaftina H. Yildirim va karên xwe yê wê hêllê da xuyankirin pê de, civîn bi axaftina dawiyê qediya.

BORÎNA

SEDAM'Ê FAŞÎST!

Karbidestên sazûmana faşîst, bi navê Sedamê faşîst belavokek diyarê alema beşerî û hêllên weşana kirin.

Ku aşîti û biratîya gela dixwaze(!). Li ser maf û biratîya herdu gelan amanc dike ku şer raweste(!). Naxwaze xwin birjê(!).

Belavoka sazûmana xwinrij û qolonyalist xwe bi hemû rengan dixemilîne. Lê alema beşerî, gelên Rojhelata-Navîn û gelê Kurdistanê, dibin hemû kirasan de rûkên nemirovî, rûreşîya qolonyalista faşîst, xwinrij û mafparêzê emperyalîzmê nas dike, û wê dibîne. Lewra ewê ku, di Rojhelata-Navîn û li navnetwa de, li hember azadixwaza, li dijî mafê gelên jêrdest radiweste, dijberîtiya gelên rizgari-xwaz dike. Û hima sazûmana xwe ya faşîst, li ser pêlên xwîna welathiz û şoreşgeran disekinîne. Bi dehan welathiz û şoreşgeran bidarvekirîye û wê didomîne. Tenq, top, balafir û êrişên xwe li ser gelê me kêm nake. Li ser gelê me, û gelê Îraqê ji bo mafê emperyalîzmê zorbazi û zilmê bêhed kirîye.

Tê zanin ku, karbidestên Îraqê, ji ber pêşveçûnên Rojhelata-Navîn û ji tesîra tekoşîna şoreşa û ji ber tekoşînen hundir ji di keftelefteka giran da ye. Û li ser mafên nemirovî, bi amanca dijberîya mafê gela herdu sazûmanên qolonyalist şer di domînin.

Di pêvajoya qolonyalistîya nûh de, bê heza abûrî, civakî, siyasî û alema beşerî, bi hemû awahî, USA alîkari bi Sedamê faşîst re dike. Dişa ji bo hebûn û mafê USA li Rojhelata-Navîn bêne parastinê û di pêşkêşîya Tirkiyê de, bêne sitrandinê, ji her alî ve alîkari tê kirin ku, ev sazûman ji bona pêkanînen li ser Rojhelata-Navîn ji Tirkiyê re bibe pêlûkek.

Jixwe tengasiya emperyalîzmê û karbidestên qolonyalist, ji wê dest pê dike. Lewra, gelên Rojhelata-Navîn û gelê me ji bo tekoşîna serxwebûnê, hebûna xwe dane ser rêya rizgariyê û li hember pêkanînen nemirovî radiwestin.

MA EM DÎQEDÎN!

Bi sazûna cunta eskerî, hejmara şoreşgerên bidarvedîbin, zêdetir dibe. Piştî hîlbijartina "Referandum"ê ku cunta jê piraniyeka giran ray sitend, ji bo zilm û zorbaziyên diwartir, piraniya raya li hemberê gelê me mîna destikeki dide xebitandinê.

Mîna tê zanin, piştî "referandum"ê eskerên cunta li welatê me mîna xwe ji nûh ve bikar anîbin, li hemû derdorên Kurdistan'ê dest bi operasyon û girtinên nûh kirin. Bê hejmar welatîyên me, dagirtin girtîxana, xistin bin îşkence. Ji bo tirsandin û me-

lisandina gel, dest bi dor vegirtin û tetbiqata kirin. Hîlbijartinê mîna darê zilmê li ser gelê me da xebitandinê. Zilm û îşkencên girtîxana girantir kir. Bê hay û baya nasên girtiya esirên destê xwe bê deng kuşt. Hemû hêza xwe ya eskerî ji nûh ve li Kurdistan'ê bi cih kir. Bi her awahî xwe karê Tekoşina Rizgariya Netewa Kurdistan'ê dike. Di nav pêkanînen hovîtî û zerpên giran de ev jê re amanc e.

Disa, bi bê deng û his li ser hev 5 şoreşgera bidarvexist. Mîna cunta; li hemberê alema beşerî raweste, bê gumana tutîşteki van yeka bikar anî. Ta pêkanînen nemirovi gihande wê qeysê, ku 5 kesên nesiyasî jî, bidarvekir. Generalên faşist mîna pêxwasek ku poz jî tutîşteki nakin, kuştin û bidarvexistînen refî bikar anîn.

Di 24 ê Çile 1983an de li Edenê Ali Aktaş û di 30. Çile 1983an de jî, Ramazan Yukarigöz, Ömer Yazgan, Erdoxan Yazgan û Mehmet Kambur jî li İzmir'ê bi darvexistin. Ji xeynî van du kesa li Emasya yê, yê din jî li Balikesir, Afyon, İsparta û li Konya yê bidarvekirin. Bi van bidarvexistînan hejmara bidarvekirina gihişte 36a.



JÎ DÎLÊ XORTÊ KURDÎSTANÊ TÎRSÎYAN!

Hêza qolonyalîst di operasyonê Wartoyê û derdorê hêllê de, xortekî 17 salî kuştin.

Hêza qolonyalîst, refa xwinrij zerp û zorbaziyên li Kurdistan'ê pêk tîne. bi diwari û hovîtî li hêla Mûş'ê û derdorên hêllê didomîne. Nexasim ew hêllên ku li nav gel, bîngêhê welathizî bi hêze, li derdorên van hêlla pêkanînen nemirovi bikar tînin.

Karbidestên faşist, nêzi meha Kanûn'ê li derdor û li Wartoyê dest bi girtinê pirane kirin. Nexasim giraniya xwe dane ser gundê A...., û R.... Li van dera gellek xort û zarûkan girtin. Li cihê îşkencexana bi metodên hovîtî, wan di îşkencê nedîtî de derbas kirin. Di 25 ê Mîjdar'ê de Feyzullah Işîk girtin. Hêzên qolonyalîsta Feyzullah, di birin binê qereqola polisê Mûş'ê. Wi di îşkencên giran de, hê şeva girtinê wî bi hovîtî dikujin. Di

danezana "tib"ê de, tê nişandan ku bi îşkence elektrîkê, bi lêdanê giran ha-



tiye kuştinê. Sedemê. derbûna kuştina Feyzullah, hêze qolonyalîst li ber vê kuştina eşkere bê rêya neximandinê ray li kuştina Feyzullah tînin.

Lê, hêzên qolonyalîst jî daxûyanbûna bûyerê hêrs dibin. mîna seh'ê har ku ji xwinê tîr nabe, ew jî bi kuştina vi xortê Kurdistan'ê tîr nabin. Ji bêçareyi kekê Feyzullah jî digrin. Û dixine bin îşkencê. Hêzên qolonyalîst bi hemû huner û destikên xwe nikarin kirasek li vê kuştinê bikin. Gelê me, mîna di hemû bûyerê jiyanê xwe de bi vê bûyerê, hêrs û hemberiya li dijî dijmin kûrtir dike.

CUNTA FAŞÎST HARBÛ YE!

Çewa li hêllên Kurdistan'ê, piştî hilbijartina "Referandum"ê, zilma karbidesta cunta faşist girantir bûbe, li hêlla me ji, operasyon, girtin, zerp û zorbaziyên hêza qolonyalist, bi hovîtî didomin.

Hêzên qolonyalist di operasyonên dawî de yek-biyek davêjin ser gundan. Li der-dorên gunda mina seh'ên har pêkanîne hovîtî bikar tînin. Bûyera nişana hovîtîya operasyona hêza qolonyalist, li hêla Hezro'yê, li gundê qahweci çê bû. Hêzên qolonyalist davêjin ser vê û der-dorên qahweci digrin. Gundiya li hev kom dikin. Jin û zarûya, xort û bapiran têdixin binê lêdanê. Dawiyê, qevda keziyê jina li destên xwe dipêçin û wan li dû xwe li ser kevir û kêsekan di kişîşînin. Di vi halî de, bi simên xwe pihîna li newq û singên jina dixin. Heta ku bêhiş bimînin, xwuşk û birayên me dibin işkence de dihêlin. Bi van hovîtîyan jî qîma wan nayê. Radîkin gundiya li hev dicivînin. Û wan di bin ser girekî, li vê derê wan hebo-hebo gendîrî xwarê dikin. Bi vê gellek gundi seqet dimînin. Di vê pêkanîne de gundiyeke 45 salî, Nûretîn, sere-jêr berdidîne xwarê, singa Nûretîn di dewixê navê û ev gundiye belengaz di vê işkence de tê kuştin.

Bi kuştina kedkarê Kurdistan, esker li hev civiya û bi lez ji vê derê bi rê ketin û çûn. Lê, ji bo ku, li hawîdoran bûyer nêbihîstin û kuştina kedkarê Kurd, bê veşartinê doktokekî ji Hezro'yê anîn kîvê. Lê kuştina vi kedkarî ne kuştineka ku karibin biniximînin. Lewra kuştin, hewqas eşkere bi nişan bû ku, doktor ji li ber vê kuştinê bê fesal ma. Nikaribû biniximîn e. Piştî ku hemû destikên wan bi kêr nehatin pe de, ferman dane esker û hemû gundiya li hev disa civandin. Piştî gotebêjeka dirêj, eşkere gefa li gundiyan xwarin ku gundi, li ser bûyerê nepeyvin, bi tu hêlla nedine hisandinê.

Disa di sergirtina gundê Enyhese-niyê de, gundiya li hev komdikin. Di nav herî û kevira de wan digerin û gendîr dikin, li erdê di kişîşînin û wan davên bin feleqê. Ji nav koma gundiyan sê gundi derdixin û dibine piştê gir. Li wê derê ji bo dengên qerîn û barinên wan, bê gundiya işkence giran li wan dikin. Demekî dirêj wan işkencên dijwar didomin. Dawiyê li derê

îşkencê dengê çar-pênc çeka tê. Piştî bêdengiyeka dirêj, esker tîn vê yekê dibêjin: "me wan kuşt!" Seresker wê hingê li gundiya vedigere. Çer û gefên nemirovi li wan dike. Ji wan re wiha dibêje: "Ger wun mina me nekin, emê vê binin serê we... Emê we bikujin...!"

Bi van leystîkê rûş û pêkanînen hovîtî ji tîr nabin. Gundiya hemû dixine nava avê û wan bi zerpê dibinê avê de dihêlin. Ta ku bihna gundiya diçike, tîne ber qeysa fetisandin û bêhişketinê, vê yekê didomînin.

Hovîtîyê eskerên qolonyalista Tirk, li hêlla Sason'ê bi zanin û eşkere ne. Li vê hêllê, di van nêza de, davêjin ser gundê Zilan'ê. Piştî eziyet û zerpên giran, mina seh'ên har bi çavsoî, van yekan li gundiya dikin.

Destên îxtîyaran li hev û dû gîredîdin. Dawiyê rûyê wan bi benekî, li

destên wayê girêdayî ve asê girê didin. Û bi sim û dar û çek û kulma dest bi lêdaneka dijwar dikin. Dema li ber lêdan, ser û çavên xwe diparêzin, an xwe dilibîtinin rûyê îxtîyara qevd-bi qevd ji qurmê ve radibe, ser û çavê wan di xwinê de dimîne. Vê li ser jina ji dicivînin. Qevdên keziyê wan, li hev girê didin. Û dest bi lêdanê dikin, dema xwe ji lêdanê birevinin, xwar bikin an ji xwe biparêzin qevdê keziya ji bini ve radibe. Bi kurtî: hovîtîya wan, nayê gotinê... Berî hemûyan pêşî dibî ku ji Kenan Evren û hevalbendên wî, bêne pirsîn: çima vê yekê dikin? Sûcê van kesa çiyê? Hurmeta we ji mafên mirovi re çiqas e?

Rasti: bi hezar caran derketîye meydana. Hê ji ew hovîtîya xwe ya ji bav û kalan me ye dimeşînin. Lê, emê bijin.

Silavên şoresgerî..

ZÎNDAN

Ger ji şerek
Hildabin û te veqetandibin;
Û ger ji alîkî te xwîn bê
Ji wî şerê sip-sor;
Namelîsî û ne bê deng bî
Çar hêllên te zindan bî çi dibel!

Ger li derva
Daxwazên te bahozan radîkin,
Û dilê te mîna wolqan
Li benda teqandinê
Mîna fitîla bîmbê bî,
Çar hêllên te zindan bî çi dibel!

Ger li derva
Agîrek hatibî dadanê,
Pêl bela bûbin li her hêllî,
Û ew agîr herikandina ber bi
Serxwebûnê be!
Çar hêllên te zindan bî çi dibel!

Ger li derva
Li derve dê, zarûkan bi leşker
dixewînin,

Û zarûk bi gîr û hêrs mezin
dibin

Te serî xwar nekiribe,
Li 'polîs' a û 'MIT'ê,
Çi kirin mabî li pîya
Û di nav işkence û lêdanan de,
bi dijwarî,

Bê deng mabî,
Bi hêvîyên sip-sor,
Ji ronahîya hatinê re bikenî;
Çar hêllên te zindan bî çi dibel!

ZÎNDAN;
Çiyê navça meydana şer be
ZÎNDAN;
Ne tunebûn be,
ZÎNDAN;
Berxwedan be,
ZÎNDAN;
Serhildan be,
Ta bîna dawîka emrê xwe li
zindanê rakevî çi dibel!

NÛHAT

DENGEK JÎ ZÎNDANÊ!

Birayê Hêja F....;

Ji demên dirêj ve ye ku me hev nediyê. Belkî ev xwezi ji tesirên hevaltiya me bê.

Min çûna te ya Almanya yê li hep-sê bihîst. Piştî ku vê yekê hînbûm, bi vê ez gellek êşiyam. Çûna te li min giran hat. Dilê min li hemberî te, bi gîr û hêrsên giran keliya. Lê, ez pê bawerim ku tu nakevî nava rewşeka ku, gîr û hêrs jê bê kişandinê. Nabi mirovê rewşeka wilo. Hin kes di derheqê te de tiştan ji mi ra gotin pê de, heyfa min li hêrsbûna pûç hat. Bi rastî min çûna te ya wê derê bi awayekî di bihistibû, lomanê li serê sekinim. Neha ev keys heye ku, rewşa me neguhare, edresa te li cem min heye û emê nerînên hev û dû baştir hîn bibin.

Bira tu dizani hevaltî û têkiliya me li ser bingehên hewqas bi hêz avabûne ku di tu hoyan de bi tu destûkan nayên qetandin. Bêşik bawerîya te ji bi vê heye. Tu bivê yekê ji dizanî ku di her doman de piştgirtin û hevkarîyan dostagiring e. Li ser vê baweriyê ji te ra dinivisim.

Di dema me de, nexasim di hoyên welatê me de, jiyaneke rast, mafên jiyaneke mirovî ne li ax û derên biyane; mirov li ser axa welatê xwe bi dest dixê. Ma imkana inkarkirina vê rastiyê heye? Nexasim eve rêya jiyane. Ez li te bawerim ku bir û bawerîya te ji ev e.

Li ber çavên min ew bûyî ku, mina pellê darê, ji bahoz û bablisokên dijwar nedihatî hilweşandinê. Lê, min bawernedikir, tê ji hejeka hêsan biweşiyayî.

Di vê nameyê de hemû nêrin û daxwazên xwe nikarim binime zman. Lê, dixwazim ku vê yekê bêjim: jiyaneke betal nebuhurîni, lê cihê te ne ewder bû... Dibîya ku tu li ew derên ku cihên te ne, lê bûnayî.

Birayê min, ger li rewşa min tu pirs biki, welew li hundirbim ji, dîsa ez başim. Ji du salan zêdetire ku di hundir da me. Lê, hê ji mahkema min bi tu mahkemên rêxistinî ve nehatiye girêdanê. Û li mahkemên eskerî yê didome. Bi biryarê bidarvekirinê; di mahkema 25.12.1980 de, cezayên 42 salan dane. Dosya min li qada biryarka-



ra ye. Ji bo ku biryar bê rakirinê, ji nûh ve mahkeme dibin. Bi gumana min wê dîsa vi cezayî bidin. Disan, ji ber berxwedanên girtixanê 8 salên di ceza dane. Ev pênc mehên ku li hepsa.....ê dimînim. Di derheqê min de li mahkema eskerî ya cezayên giran, mahkema nûh vekirin e. Ew ji ji ber karbûna revê ye. Bi gumana min, an ewê cezaki hindik bidin, an ji ezê jê beraat bibim. Tam li ber gihîştina azadiyê, ku tam min gavên xwe yê dawiyê ber bi rizgarbûnê ve diavêt, xwesipareki dilreş gilîyê min kir, hatim girtinê. Ez bi vê gellek êşiyam. Lê, bere-bere tê me ser xwe.

Hevalo! Tu zani ku jiyana şereki ye. Jiyana bê şer û ceng pûç û betal e. Ger şerê me li derva berdeyam dibe -bêşik didome- wê hingê em dijin.


Bi van nivîsên namê, amanca min, ne ewe ku li te şîretan bikim. Dibe em, hev nebinin. Lê, rastiyêk heye ku emê bigihîjin serfiraziyê.

Tu dizanî ku; pûçbûn û nepûçbûna civakan, hebûn û tunebûna rihê jiyandomandina civakan di nav şeran de êşkere dibe. Wê civaka me ji di nav şerên wiha de bi kemile. Û ewê şerva-

nên ronahiyê biafirin. Ro bi ro pêlên agirê şoreşê li derdorên welata dikemile. Kole serên xwe radikin, jêrdest şiyar dibin, dest davêjin çekan, sazûmanên hejoke, jiyana rûreş, ewê ji şeran ta neynûkan bêne guhartinê. Dinyaka nûh, dinyaka geş û ronahi ewê bê afirandinê.

Lê çineka weke goşt û neynûkan li hev keliya be, ji me ra divê. Ku ta dawiyê biryarvan be. Ji me ra ne berxên şîr, sistok û nermoke divên. Ewên dema şer li sitûyên wan dibe ber û nabêjin "marê ku têkiliyê min nabe, bila sedsal bijî" û ji şer narevin, ji me ra divên. Ne ewên ji ber şer direvin, mîna kîzên serşoyan qulên ku were ber wana serê xwe bixinê. Ji me ra yên ku bi hemû hêza xwe. lêdidin, bi derbên xwe hilweşandinan ûnîn berçavan, çavtirsîyê tu tiştan nîbe, ew divên.

Ji mirovan re tu tişt ji jiyane bi rûmetir nîne. Lewra, mirov carekî tê dinê. Ji her mirovî re ev yek, rêya hebûnê ye; bê eşandina rewş û gemarên jiyana berê, jiyane li ser rêya rizgariyê karbine û vê jiyana aza û bi



rûmet ta mirinê bidomine. Dibi ku mirov bi vi awahi bijî. Û dibi ku em bê rawestandî û bê betlahî, di hemû jiyana de taybetên pak biafirînin.

Hevalo! ew cihên ku dibi em lê bin, ew in cihên me û jiyana me ew derin. Sekna wê derê ta dawiyê ez ji lê bawerim ku ne mimkî e. Daxwaz û baweriya min e ku tu û kesên kari bi xwe ra bini - di demekî nêz de winê veşerî cihê xwe. Ger bê zanîna rewşa jiyana te, min dest bi şîret û kifşkirîna kirîbe. Vê yekê û li vê kêmasiya min bibihure. Ne hewceye ku dirêj bêjim. Ger bersiva nameya min birêki, ezê pê kêfxweş bibim.

Rewşên jiyana hepsê ji bini ve nebaşin. Îşkence û ezîyetên giran hene. Ji bo serxwarkirinê çî destik hebin, hemû bikar ûnîn. Li hemberê vê yekê, berxwedanên mezin pêk tên. Li berxwedanên hepsê, li ser gellek destikan pêk tên. Mina agirdadanê, rojîya mirinê, serhildan û dijberîti hwd.. Lê,

piranê berxwedana bi rojîya mirinê pêk tên. Heta neha birçibûna dirêj li hepsa Diyarbekir 48 roj berdewam bûye. Di vê berxwedanê de, 4 şoreşger şehîd ketin. Li girtîxana Elezîzê bi sedan berxwedanên birçibûnê çêbûn. Roj, bê îşkence nabihurîn. Û berxwedana birçibûnê roja 18. didomîne.

Zindan bûne cihên tekoşinê. Berxwedanên bê emsal li zindanan pêk tên. Hewqas ku pêlên berxwedanan kesên xwesipar ji girtin e. Ji nûh va diafirîn û dikevin nav sefê berxwedanên. Berxwedan dibe serfirazi, lê xwesiparî dibe xayintî yê.

Kesên ji berê ve hatin e girtinê, bûne derdevkê karbidestên hepsê, têkiliyê tu tiştêki nabin. Ji ber vê rewşê, li hember zilm û îşkencên dijmin singvegirtin, diwartir dibe.

Bi hemû daxwaz û hêviyan. silavên dilgerm li te dikim.

Heey stêra sor!

Li ber bangê

Dema nobetê didî rojê,

Jê ra bêje,

*Diroka vi şerî, bila kûr
binivisîne.*

Ku em;

Ji zû de pêşberê silahbûne,

Li kûrî û dawiyên kozikan,

Mîna lûla sip-sor.

Û weke xortê bist salî ciwan,

Serê me rast, dilê me bi hêz.

Wiha em hinbûne.

Û emê wiha bidomînin jîyanê.

Rê dirêj...

Rê dijwar.

*Şervan birçî, şervan bê xew
û betlandî.*

Ne sebrê nasir girêda, û

Ne ji qelş çêbûn di singê de.

*Bi adana tekoşîna xwe, em hinê jîyanê
bûn.*

Serê me rast û

dilê me bi hêz.

*Me biryardayê ji domandîna vi şerî re
Ta ku sinbil bi azadî şîn bîn...*

Hilgirtîna evîna te,

Mîna canê her bîn, li ber mirinê.

Hilgirtîna evîna te,

*Mîna demika di jîyanê de carek bi dest
dibe û ji bir naçe.*

Hilgirtîna evîniya te,

*Mîna hilmeka piştî îşkence û lêdanê,
dikşînim ji çixara xwe.*

Bi hilgirtîna evîna te,

Mîna veşeriyabîm qêda û belayê wê.

Evîna min; hesreta min; canê min...

Welatê min Kurdistan...!

F.G.

LÎ DIJÎ DIJMÎN HÊRS Û HEMBERÎYA GEL KÛR DÎBE!

Di ser destgirtina sazûmana karbides-tê faşista qolonyalist de 3 salên ku derbas dibin. Bi amanca tunekirina gelê Kurdistan'ê ev 3 salin ku li ser gelê me zilm û zorbazi yên melisandinê sist nabin. Nexasim diwartir dibin. Zerp û zorbaziyên qolonyalista gihaye qeysa pêkaninên nemirovi. Hewqasan ku; zerp û zilma hêzên karbides-tê çiqas bêne gotinê, çiqas bêne zman, dîsanê teghiştina dijwariya zerp û îşkencên giran ewê kêr bimîne. Bi her awahi tēgihiştina wan çênabe.

Bi rastî zilm û zerpa ku li ser gelê me tēne meşandinê bi rêyên wilo pêk tēn ku yên mirov be, li van pêkaninên faşista diheyire û lê kûr diponije. Ji bo ku li Kurdistan'ê mirov, jiyaneke mirovi bidomine ji rêya tekoşinê pêştir tu rê neman e.



Lewra, îşkence û darê zerpê, operasyon û girtin her roj zêde dibin û pêkanin tēne jidandinê. Girtina serê kuça, zîqaq û taxan, seravêtina gund û mala bûne pareki jiyana gelê me. Jiyan bê van nabihure. Bere-bere ew tirs û şikên dema berê, ber bi hêrs û hemberiyê va cih diguhurin. Tirs û şikên giran neman e. Her kesên Kurdistan'ê, hinê van yekan bûye; wê kîngê û wê bi çi awahî operasyona çekin û di dawiya operasyona de wê çibibe. Kedkarên Kurdistan'ê bi jiyana xwe hinê van bûne. Ji ber vê rewşê, xwe ji berê ve hazirê van yekan dikin.

Hêzên qolonyalista di nava gelê Kurdistan'ê de hemû destik û leys-

tikên xwe bikar tînin. Nexasim, destik û leystikên xwe bi girani li ser şer û berberiyên eşira bikar tînin. Ya rastî van yekan kêrî xwe tînin. Ew pozberiyên ku li ber yekbûnî û hevkarîya gel radiwestin, û gelê me bi hev û du dide şikandinê, ji qolonyalista Tirk, fen û leystikên dijmin re dibine destik. Ji bo vê yekê jî, dijmin, berberiya eşira ji nûh ve dadide. Berberiyên eşiran tesirên giran li civakê dikin. Heta ku dem-bidem berberiya eşira dibine sedemê şerên giran. Li hêllên ku, bingehên berberiya eşira rabûye, an ji li derên ku jar maye, li van deran hêzên qolonyalista dijberiyên nûh derdikin. Û leystik û fenên nûh dixebitînin. Nexasim piştî hîlbijartina "anayasa"yê bi firehî pêkaninên xwe didominin. Karbides-tên faşist li ser giliyên ber-

serekên eşiran yeko-yeko dikşinin ifada. Û ji wan pirsan dikin, ku kesên ray li "anayasa"yê neanine nasbikin kine. Ji ber vê yekê gotin û îşkencên giran li muxtar û serekên eşiran dikin. Ger ev kes jî amanca wan re nebin destik, wanji cih û wezîfên wan digrin. Lê, pêkaninên faşista bi van yekan ji nasekine. Bi giliyên derewin girseyên gel, li hev û dû dikine dijmin. Kesên li hember van berberiya dertên an çima wan nayê, leystik û amancên li ser şerên eşiran tēne meşandinê, pê dizanin ji hêllên gunditî, malên xwe bar dikin bajêra, an ji diçin metropolê. Vê rêya felatiyê dibinin.

Metodên ji destpêkê ve ji bo civandina çekan bikar dianin, bi pêkaninên nû ev tēne domandinê. Muxtar û berdevkên dewletê li hêllan navê gundiya dinivisînin û van nava dibin didine qereqolê. Esker davên ser van gunda û kesê ku navê wan nivisandi be, ji wana çek û peran dixwazin. Yên ku di destê wan de tune be, lēdanên giran li wan dikin û wiha gefan li wan dixwin; "heke wun nikaribin çeka bistînin, jinê xwe bifroşin, bi perê wan çekan bistînin bidine me..." Bi çi awahi dibe-bila bibe ille wê çeka ji gundiyan bistînin. Nexasim ew derdorên li wana bingehên welathizî bi hêz e, kêrî şoreşgeran tēn, wan xwedî dikin, bi dijwarî li ser van hêllan disekin.

Pirsgirêkê giran ji buhatî û zem e. Lewra her roj zêde dibin. Ji ber buhabûn û zemê, rewşa jiyana û debarê kêr dibe. Mîna gel hatibe ber qeysa sefîlî û belengaziyê, ta kirta gerokiyê. Heke karkerî û hemalî bi dest bikeve, ew ji buhayê wî ji 500î zêdetir nîne. Di vê rewşê de welew kiloya şekir -ku 150 ye- tenê mirov bide hişê xwe, tēgihiştina vê gellek hêsan dibe, ku li welatê me domandina jiyane di vi hoyî de gellek dijwar e. Ji ber vê rewşa dijwar, ji demên berê zêdetir ji hêllên gundan gundîne kedkar, koçberî bajêran dibin. Her roj zêdetir rêya felatbûnê di tekoşin û rêya şoreşê de dibinin. Ji sedemê ku ev tēgihiştin fireh dibe ku hêza qolonyalista vê li ber çavên xwe dibinin, ji hêlleki, zerp û girtin û îşkencên giran didominin, ji alîki ve ji bo ku ev hêza civandî, ber bi rêya şoreşê de nekemile, mîna darê zerpê, olitî di xebitînin. Camiya kirine

devkên xwe, pozberiyên nava gel li hev tuj dikin. Amanca wana vi alî eve ku, pozberiyên nava gel herdem germ bihêlin. Ji bo vê yekê jî hemû berdevkên xwe, leystik û fenên xwe dixebitînin. Mîna hêrsa ji netica hîlbijartinê sitendine bi hemû pêkaninên dijwar hêrsa xwe vedireşine ser gelê me. Ji ber dema hîlbijartinê, netica ji Kurdistan'ê hêvî dikirin bi destê wan neket, hejmareka pêwîst ray li "anayasa"yê neani, hêzên qolonyalist bi vê harbûnê mîna ji nûh ve êrişî ser gelê me bike, destikên hovitîyê ji nûh ve xebitandin.

Ew kesên ku di hîlbijartinê de berpirsiyari li gundan sitendine, muxtar û

meydana weşandina îdiolojiya faşistî. Li camiya, piştî waz'ên oli; mêjiyên mirovan bi jariya îdiolojiya faşist û bi kemalizmê dadigirin. Fermane ku, van li çamiyan pêk binin. Meleyên ku van bi cih naynin, ji aliyê muxtaran ve têne kifşkirinê, wan digrin û îşkencê giran li wan dikin.

Nexasim betalî gihaye qeysa bilindî. Ji ber seknandina karên avayîya di nav civakê de bi milyona betal ma ne. Çewa bêkari bi xwe ra birçibûnê tîne, li nav civakê kefte-leftên giran çê dibe; dizî, dînbûn û xwe bidarvekirin hwd. ji jiyana civakê kêrnabin. Welaw ji bo kar li hêlleki daxûyanek diyar bûbe, sedhezhar kes serî lê didin, ew ji bi vê hêviyê "te di ku qedêr li ruyê me kenî ya!" Demên berê ku fişên bê bûha, dihatin e sitendinê, neha bûhayê wan 500 e. Ger ku bi dest bikevin...! Sitendina karkeran bi imtîhana pêk tînin. Pirsên imtîhanê hemû li ser îdiolojiya faşizmê ne. Yanî rêya gihîştina kar, hebandina vî îdiolojiyê ye. Dan û sitendina bertilê bûye usûla wan. Lewra; ji dirokê ve qolonyalîsta Tirk hebûna xwe li ser talanbaziya meşandiye û hê didomî ne. Hebûna xwe li vî digre. Vê taybeta xwe ya diroki bê kêmasî dixebitî ne. Li hemû qadên dewleta faşist ji dergevan û eskeran, ji qerdiyan û pêxwasê ajana ta generala ji bertilê pay distînin. Bi gili û fenê derewîn kesan digrin û ji nas û maliyên wan bertilên mezin distînin. Li gellek hêllan bertil sitendinê anîne wê qeyse ku mîna mîaş, her meh distînin. Gundiyên van hêlla di nav-bera xwe da pere kom dikin û mîna curmê didine wan. Nexasim li ser hêllên girtîyan vî eşkere didominin. Li hemû hepsan qawîşan ji hev vediqetînin. Û nawan li wan dikin qawîşa hêsan, qawîşa zerp û îşkencê û maliyên girtîyan bi vî dihisin. Bi vî awahî, nas û maliyên girtîyan dişêlin.

Cunta faşist e qolonyalîsta Tirk welew pêkanînen hovîtî û zilm û zor-baziyên nemirovî li ser gelê me meşandibe, rêberên bi rûmet kuştî be ji dîsa li hêllên girtîxana di nav îşkencên nedîtî de liberxwedanên şoreşgerî bi biryarî tîn domandinê. Şervanên rizgarîyê, êsîrên şerê serxwebûnê mîna hestî û çermên hişk mabin ji ala şoreşê naxinin erdê. Welew ji îşkencên giran seqet mabin, bi nexweşînen giran ketûbin ji ev rasûyeka bi nişan e. Têgihîştina, hovîtîyên li girtîxana pêk tîn ne

mumkin e kesên ku ji demên dirêj va dibin van ezîyet û îşkencên giran de mane, piştî berdanê ji bin tesîra pêkanînen hovîtî demayên. Mîna robota, li ser hev marşê "Tirk im, doxrûyûm", "dê ya min Tirk, bav e min Tirk, ez Tirk, kurê Tirka me..." hwd. dibêjin. Ev yek bi xwe dibe nişana hovîtî û pêkanînen girtîxana.

Bêşik, hêleka ku karbidestên faşist li serê disekine ew ji, xort û xwendevanên Kurdistanê ne. Hilî û giraniya xwe li ser vî hêllê bikar tînin. Lewra, hêzên qolonyalîst, bi tîgihîştina rola xort û xwendevanên Kurdistanê di tekoşîna şoreşê de ku dileyîzin, bi amanca melisandin û pejrandinê hêza xortên Kurdistanê, hemû destikên xwe bikar tîne. Amanc dike ku wan li nav civakê pûç û bêteşe bihêle. Ji bo vî yekê jî, li hêllê gundan ta taxê bajêran cihê kêf û leystîka topê vedike. Ji aliyek jî; di bin destên faşist û polîsan de vexwarîna araqê, qumar û tolazîyê bela dike.

Ji destpêka xwendinê ta dibistanên din, hiş û mêjiyên zaroyan û xortan, bi jariya îdiolojiya faşizmê dide şûştinê. Di bin destê seresker û mufîyan de, şoreşgerî û "Kurtçî" nîzm dixînin, bi derew û rûreşî didine nasîkirinê. Hemû pirtûkên dibistanê bi îdioloji û peznê faşizmê dagirtî ne. Yê ku dijberiyên piçûk ji nişan didin, wan jî dibistanê davêjin û dixîne hepsê. Bi imtîhanên ku danîne ber xortên kedkaran, imkana xwendina dibistanên bilind ji ber wan rakirin e. Piraniya xort û xwendevanan sedemê vî yekê di nav civakê de betal dimînin. Bêşik, di hemû pêkanînen xwe de amanc digrin ku xortên Kurdistanê ji pirs-girêkan dûr bimînin; xwe nasnekin û bêteşe biafirin.

Pêkanîneka hêzên qolonyalîst ji ev e: ji ber ku li hêllên gundîyên dibistanê lê tune ne, eskerên qolonyalîsta Tirk davêjin ser gundan û çiqas zaroyên 5-12 salî hebin hemû jî derdorên gunda dicivînin û wan dibin davêjin êtîmxana ku piraniya zarokan ji hawirdorên gunda karê malê û şivaniyê dikin. Ev pêkanîna hêza qolonyalîstan dişuhube pêkanînen demê berê ya "ocaxên Yenî Çer" ya. Di nava gel de dijberîya vî pêkanîne bela dibe. Ji bo ku zarokên xwe bi parêzin, gundî, dest ji gundê xwe berdidin û terkederên hêllên çîya û şikeftan dibin.

Li hêllên gundîyên ku hemû debarên gundîya li ser daristanê ye, ji darê ziwa ta civandina qirşîka li wan qedexê kirin e. A rastî wan jî destikên debarê birî ne. Ji ber vî yekê, herdem li dû gundîya digerin. Dema gundî tîne girtinê, îşkencê giran li wan dikin. Ker û qantîra wan difiroşin, kurtanê ker û qantîrê dişewitînin. Bi kurtî; li ser van gundîya çî jî destê wan tê bikar tînin. Di van pêkanînan de bûyera dawî li hêlla Sêrtê çê dibe. Gundîyê ku ji bo lawê xwe yê nexweş derman bistîne, dema bi barê êzinga diçe bajêr, wî digrin û dest davêjin ser malê wî. Piştî ezîyet û îşkencên giran 3 meh ceza didinê. Lê, ji ber tenê ev rêya debara gundîya ye, gundî hemû zerp û dijwariya didine ber çavên xwe, ji bo birçî nemînin vî yekê di meşînin. Em dev ji destxistina derman berdin, gundîyê li ser nexweşîna xwe digere, ji xeynî buhayê rê -ku heroj zem tê ser benzîne - dema ku gavên xwe davêje nexweşxanê, pêşî 500î dide. Bi vî şêlandinê welew çare ji nexweşîna xwe ra bibîne jî, perê derman di destên wî de namîne û bi berîka vala, bê mecal vedigere malê.


Hêza qolonyalîst, li ser hêllên ku Tekoşîna Serxwebûna Kurdistanê bi geşî hati be hebandinê û lê bîngeh girtî be, li ser hêlla Adiyamanê, Batman û Mêrdînê hwd. bi giranî diseki ne. Li hêlla Batmanê û Ceylanpînarê 300 Afgani bi cih kirin e. Ji wan, li hemberê tekoşîna rizgariya netewa refa ajan, hêzên milîs saz dikin. Mîna li roava Vietnamê gundîyan bi eşîrî, ehl û cîrantî û hunermendî jî hev par vekirin e.

Li ser van yeka tevgersaziya wan pêk tînin. Hatine kesên biyane, gera hêllê û tîkîliyên şoreşgeran bi wan derbixin meydane.


Karbidestên faşist xwedîyê gellek imtîyaza ne. Dema diçin qahwê, cihê xweş kîjan be ew der jî wan re hazir dibe. Li derên aşxana, cihên bilind ji wan ra ye. Ev rewş bi her awahî berçav dikeve.

Ji sedsalan ve ye ku gelê me li hemberê pêkanînen dijmin sing vegirtî ye û di salên dawî de li ser rêya Tekoşîna Serxwebûna Kurdistanê hebûn û tekoşîna xwe diyar kirî ye. Hemû pêkanînan ji kûrkirîna gora sazûmana qolonyalîst pêştir tu fêde nade. Û ewê rojên seraxkirîna gore bînin...

18 û 19 ê GULANÊ



Haki KARER



Xelil ÇAVGUN

Rojên 18 û 19 ê Gulanê di dîrok û berxwedana tekoşîna gelê Kurdistan de, hewqas bi mane, hewqas xwedi taybetên bê emsal in ku: tu dem jibir nayên kirin. Û ji taybetên xwe tu ûştek wunda nakin. Lewra pêvajoka berxwedana tekoşîna gelê Kurdistan û taybetên tekoşîna demê li xwe nexşandin e.

Ji rêberên, berxwedana Tekoşîna Serxwebûn û Azadiya Kurdistan'ê, rêberê navdar, şervanê enternasyonalîst Haki KARER di 18 ê Gulanê 1977an de, ji hêlla berdevkê qolonyalîsta Tirk, "Sîtêrka Sor" ve, hogir Xelil ÇAVGUN; bi dêstê pêxwasên qolonyalîsta Tirk feodal-kompradoran ve di 19 ê Gulanê 1978an de hatin kuştin.

Ev büyerên bi mane û giran, hogirên navdar; ji bo têgihîştina dijwariyên şoreşa Kurdistan'ê, zerp û hoviüyên qolonyalîsta Tirk û ji bo naskirina xasiyên şoreşgeri, ezm û baweriya şoreşê kaniyên bê emsal in.

Hogir Haki, ji nav dilê karkerên Tirkîyê derketibû. Û hebûn û jiyana xwe ya rêber, li ser taybetên enternasyonalîstî di oxira Tekoşîna Serxwebûn û Azadiya Kurdistan de danibû. Hogir Xelil perek ji dilê kedkarên Kurdistan, jiyaneke bi nişan e; di tekoşin û berxwedana serxwebûna

Kurdistan'ê de li sefê kedkar û gundiye Kurdistan, bi taybetên rêberî çih girti bû. Ew deng û hilma kedkarên Kurdistan bûn. Daxwaz û hêviya taybetên gel jiyana xwe nexşandibûn.

Bi baweriya ilmê cihanê, û amanca şoreşê, bi xebat û tekoşinên xwe, wan ne tenê rûreşî û gerineka sosyal-şovenîzmê, xwesiparî û tengnetewkarê burjuvaziya piçûk, ku li Kurdistan'ê hêlinên serxwariyê vedigirtin kiras û rûreşîya tewrên hember gel û şoreşê daxistin meydanê. Di nav hemû êriş û hoyên dijwar de taybetên şoreşgerî û şoreşa Kurdistan'ê parastin pêş de birin. Bi xebatên xwe yê bê emsal ji gellek pirsgerîkên şoreşê, civak û netewa Kurdistan'ê re bersiv anin.

Ji derbûn û ber kemilandina, Berxwedana Tekoşîna Serxwebûna Kurdistan ve; li hember tewrê berxwedanê, amanca serxwebûnê, rêberî û partîya hemdemî, tevgersaziya karker û kedkaran û li diji gel û xwebawerî û parastina taybetên gel û şoreşê qolonyalîsta Tirk, burjuvayê hov; hemû destikên xwe, êriş û hêza xwe ya zerpê, eşkere daxiste meydanê. Êrişên xwe diwartir kir. Lewra pêvajok bi xwe, di tekoşîna gelê Kurdistan'ê de kemilandin û xemlgirtina şoreşgerî bû û rêya hebandina hebûn û tekoşinê li

ser vebûbû, ku tekoşîna vê pêvajoyê:

Li hember amandana tunekirina gelê Kurdistan, li diji dimîn, amanca hebûn û domandina berxwedanê;

Li hember hêza êrişbaziya qolonyalîsta Tirk, li diji zerp û zorbaziyên nemirovî; pêkanîna berxwedana tekoşîna şoreşgerî û zerpa şoreşê;

Li hember nebawerî, xwesiparî, mafên arizî, jiyânên bê teşe û nemirovî; gel û xwebawerî, dilsoz û biryarvani, xasiya berxwedanê û mafparêziya gel û şoreşê;

Û li diji komik û rêxistinên lihevhatî, amancên tev-lihev, bingehe rêxistina şoreşê, rêxistina mîna pola hevkar û hevgirti, partîya şoreşê û amanca serxwebûnê bi zelalî bi jiyân û tekoşinên bê emsal kemilandin. Li ser oxira taybetên bê emsal di rêya şoreşa Kurdistan de şehîd bûn. Pêxistin û parastina van taybetên serfiraziyê büye karê jiyana me hemûyan. Wan rê kir rêya şoreşê û bê dudilî li ser vê rêya bi rûmet meşyan. Rêya me hêsan û bêtirs kirin, bi jiyân û xwîna xwe ya pak.

Ew di dilê karkerên gelê me û Tekoşîna Serxwebûna Kurdistan de dijin!

NEWROZ BÛ PERGALÊ JÎYANÊ!

Di bin nîrê cunta faşista qolonyalistî de, 3 salên ku jîyaneka dijwar tê domandî-nê, qolonyalistên Tirk; hemû hunerên zorbaziyê, pêkanî-nên hovîtiyê, li ser gelê me yê rizgarî-xwaz pêk ani.

Bi sedan rizgarxwazên welatê me, dilsozên gelê me dagirtî ye girtî-xanên nemirovî, bi dehan şoreşger û welathîzên, di dilê gelê



me de cih vegirtine, li çîyan, li gundan, li bajêran û nexasim ji li girtî-xanên nemirovî bi berik û îşkencan, bi şewitandin û qetlîam hovîti bejna wan ji nav me rakir. Lê qolonyalista Tirk, burjuvayê hov; agir û ezm'ê Tekoşîna Serxwebûna Kurdistan, berxwedana şoreşgerî û ezm'ê serhildan û hemberîya gelê me ne şikand. Gelê me bê deng nema. Ezm'ê berxwedanê ro-biro geştîr bû. Ber bi bingehgirtinê va çû. Çirîskên pêşveçûna berxwedana, li hawirdorên Kurdistan'ê, nexasim li girtî-xana Diyarbekir pêlên agir vêxistin. Pellên agirê Berxwedana Serxwebûna Kurdistan'ê hilm û gulma xwe li ser welat û gelê me nişan da. Mîna berxwedanên girtî-xanê. Weke zereqa rojê şewq li hawirdorên Kurdistan'ê da be; Kurdistan ji nûh ve ronahî bû. Taybet û serpêhatinên gel, geş bûn. Bi hemdemê ra xeml girtin.

Welew ku dirok û bûyerên Newroz'ê bêne biranînê, wê têgihîştina Newroz û Kawa'yê hemden zelal bibê. Lewra, di ber hoyên koletî de; bi berxwedanên nişane, bi serhildanên dijwar, bi şerê dirêj li hemberê koledarê demê, bi rêberî û şervaniya gelê me NEWROZ afirî ye. Di hoyê bê fesal, li ber dijminê dijwar de, gelê Kurdistan; li ber hebûn û tunebûnê, di şerekî dem dirêj de bi tekoşin û berxwedanên mezin rêya hebûna xwe ya gihiştina demê vekirî ye. Di vê oxirê de gellek xweşmêra daye. Rêya pêşketina gelan bi tekoşin û berxwedanên bê hempa vekirî ye. Hoyê tantiyê, nîrê koledarî ji hev par vekirî ye.

Bê guman, bûyera ku di dirokê de hatiye afirandinê, ji gelê me ra gellek pêwîst e. Lewra vê pêvajoka ku bi

navê NEWROZ û KAWA ta rojên me têne biranîn, gellek taybetên bi rûmet didine danezandinê. Xweşi, dilpaki, nûbûn, tekoşin, serhildan, serxwebûn û azadîxwaz, ezm'ê hebûn û biryarvanî hwd. hemû ji xeml û rêdanên bûyerê tên derxistin. Berî her tiştî, rêya hebandina hebûnê, gihiştina demê, li dijî dijmin û rêya tunebûnê, ezm'ê hebûn û tekoşina gel bi zelalî derdike meydanê. Bi rastî taybet û serfiraziyên Newroz'ê di hemû hoyan de bikar tînin. Jiyana rast û mirovî li ser van digihîje rastî yê. Nexasim, dijberîya bîndestî û xwe bawerî dide zanînê.

Bi van taybetên esasi di dirok û hoyên guhartî de, Newroz û Kawa yê hemdem, bi derbûna tekoşina Serxwebûna Kurdistan û bi tekoşin û berxwedanê tevgersaziya karkerên Kurdistan û rêberên bê emsal Newroz gihiştê rastîya xwe. Taybetên Newroz'ê di hiş û mêjüyên gelê me de hêlin vegirtin.

Lewra, di sedsala XXan de, Dehaqên nûh bi zerp û zorbaziyên dijwar, pêkanî-nên nemirovî û bi êrişên tunekirinê dixwazin ku gelê me ji pêvajoka hemdemî, ji pêvajoya diroka hemdem veqetînin bi melîsinin, ji gelên cihanê dîr bixînin û ji rûkên erdê vemirînin.

Hoyên jiyana gelê me bi eşkere dide zanîn ku; dijminên gelê me, mîna dehaqên kevnare har û dijwar in.

Lê mîna diroka gelê me, û yên gelên cihanê dane zanandin; dijminên

gelan hêzê koledar, çiqas zorbaz bin, çiqas hovber bin, welew ku hebûna xwe li ser zerpa eskerî ji bîmesînin; gelên jêrdest ji rêya rizgarî û serxwebûnê gavan navên paş û di vê oxirê de lawên xwe yê bi rûmet pêşkêşî dergaha azadiyê dikin. Diroka xwe ya azadiyê bi xwinê dinivîsinin.

Di sala 1982an 21 ê Adarê li girtî-

xana Diyarbekir bûyera kû pêkhat, şehîdbûna rêberê tekoşina gelê Kurdistan, endamê KM ya PKK Mazlum DOĞAN bi hemû pergalên xwe, bi berxwedanên bê emsal ev yek bixwe bû ku bi hebûna xwe di girtî-xana hoyên nemirovî de di nav hovîti û îşkencên dijwar de, taybetên tekoşina gel û partiyê, xasiya şoreşgerî û rêberîya gel û taybetên Newroz û Kawa yê nûdem cîkîrim parast û pêtiyê Newrozê di nav tîlên pêçayî, deriyên hesin, û diwarên bi rêz de pêxist. Li ser kotina bejna xwe berxwedan û taybetên tekoşina gelê Kurdistan'ê gihan de perê asiman. Kaniya pezn û serfiraziya Newroz û Kawa, li xwe civand. Bi bir û bawerîya taybetên şoreşgerî, welathîzî, û taybet û serfiraziyên Newroz û Kawa yê hemdem li Stockholm'ê di şeva pîroziya Newroz'ê de, bi proxram, folklor û helbestên şoreşgerî û gelêrî, gîrsa koçberê Kurdistan şehîd û taybetên welathîzî û Tekoşina Serxwebûna Kurdistan'ê heband. Bi dilpaki û geşî taybet û hebûna xwe jîya.

Koma Berxwedan, bi hemû xeml û leystikên gelêrî, bala hemû guhdarvanan bi girani kişand. Ozan Şivan, Gulistan, Mizgin û Çiya bi hunerên şoreşgerî geşîya şevê nexşandin. Tiyatroya ku hate pêşkêşkirin, ku jiyana gelê me, berxwedanên hepsê û hovîtiya qolonyalîstan anî ber çavan, bala hemû guhdaran li xwe girt.

**WÊ HER BÎJÎ NEWROZ!
BÎJÎ TEKOŞÎNA RÎZGARÎYA GELÊ KURDÎSTAN!
ŞEHÎDÊN KURDÎSTAN BÊ MÎRÎNÎN!**

TÎYATRO

(Diyarbekir...)

Mina bajarê mirî, mina çiyayê ji mij û dûmanê li ber binçikandinê, bi xemla roja nû, bi hêrs û heybetek giran, ji nav rêşiya beyanê, ewr û şîna şevê radibe... Mina devê kewarê bi xumîne... Erd'a reş, bejiya gewr, kevîrên reş, benda rêsayî... burcên sale-wextan, xemgîn û tazi...! Bere-bere ji der-doran xûyan dibe, kaniya bê pêl û bêl. Ji çol û beyanan, xaçerê û caddan ber pê diherikin! Ma ew çiyê? Çi bûye ji Diclê? Çima piştî xwe dayê? Berê xwe daye ku?!

Ji fixan û pêlên kul û birinan, ji hawar û girri çav lê sor-bûye... Ji piştî geroka welatê rêsayî hilm û gulm radibe... Bi barên qurnê salan, diherike, bi gazin û qerîn... Ge xwe radixe ber, ge pêlên xedar radike li hember. Ge dixwaze, wê dixê nav himbêza xwe, ge ji sist û nerm dike gera xwe. Mina dilketiyê wê be. Bi seyran û dilan, ge ji, lê vedigere bi girri û fixan; "damara dilê Kurdistanê"; kaniya êş û xem'a. Dilê bi birin... haa... Diyarbekir'ra dil bixwin.

Wê navê te bijî, ta ku dînya hebe. Binêre.. tu bi hemû xeml û rêdanên xwe bi rûmet û heybetên xwe yê qurna salan, diroka xwe ya hemdemî diji. Êsîrî û belengazî, qirkirin û qetliamên bi destên qolonyalîstan, ji qurnên salan ve pêkhatine, li ser nav û hebunan te, hesabê wan yek-biyek tê pîrsinê. Bi bernava Kurdistanê tu, ji me ra bûyî kaniya pezn û serfiraziyê. Nayê ji birkirin navê te Diyarbekir...

Diyarbekir... Diyarbekir navê te xweşe, şana te ji berxwedanên zindana gihaye bandevî. Bi xeml û rêdana xwe dibî tîrsa dilê dijmin. Ji te qewet distînin nas û dost Diyarbekir...! Emê bijîn û bi hev re bibînin berxwedaran û emê bi çavên xwe bibînin xwesiparan...

Û emê bi hev ra bibînin çewan li hember hemû êş û îşkencan çewan sing tê vegirtin, çewa rûmetên Partiyê tene parastin, û çewan agirê serxwebûnê, pêllên berxwedana ji ser destan ta dilan tê gerandin, û emê bibînin, çewa kozê agirê berxwedanê naxin erdê.

Diyarbekir... li ber zeraqa rojê, tirêjên ronahiyê emê li ser bircên bendewar, ala azadiyê, ala sip-sor biçikinin.

SAHNE I

Qawîşeka tevli-hev derketiyê berhewayê. Zangerî di-kin. Hejmara girtiyê qawîşê gellek e. Di destên qerdiyan û lédankara de darên lédanê hene. Her yek mîna rewtelek e. Girtiyek li qunc di nav xwinê de dirêj kirîye. Bi vekirina perdê, girtî hemû dikevin weziyeta rêzê... Ji bazdan û lédanan hemû perîşan xuyane...

Qerdiyan- Na..! Na..! Nabe! Nebû.. puştno! Disa.. disa. Zû rêz be! Milên xwe berdî: rihet! Hazîr! Li pêş binêr. Bi gavên normal bi me! Veger milê rastê! Bi mêş!

Ûla, Ûla pêzeweng. Lawê qeşmera.. Min dapi-rê K... Yo.. milê xwe bi hejine! Çokê xwe bikşîne! Puşt! Wîlo neşkîne! Ji ter dibem, xwar neke... tolazê kurê tolaza! Disa vegerin rastê.. pêş de!

Qerdiyan bazda û bi lepên xwe wi hejand, da-xiste erdê û bi kulm û siman kete ser...

Rabe.. zû.. zû.. lan.. Ûla ibne xwe nehejine ha! Vegerin rastê... Pêş ve... rast bi meşin haydê! wê marşa "Ez Tirkim, babê min Tirk" bi banga meşinê bê jimartin. Hemû bi hev re bi gav avêtî-neki peyvokek dibêjin: ez Tirk kurê Tirk'im. Li ser hev sê car tê gotin û qerdiyan pêşkêşî wan dike: - Wetan, te re canê min fîda, bijmêr!

Hemû mîna qerdiyan sê car li ser-hev marşê dibê: we-tan te-re ca-nê min fi-da.

Qerdiyan- Ûla puştno, ma wun mirine.

Bi gef û sewta qerdiyan deng hê bilintir dibe. Ji nişka va li yê serî dike borin:

- Çoka bikşî, wuha bi hejine. Hi-ha wusa ha... Puştê min, ling xistûye d... û x...an!

- Haydê! wê marş'a "Tirk'ê her mezin Atatirk" wê bê jimartinê. dest pê ke!

Hemû disa li ser-hev, bi dengêki bilind marşê dibê:

"Tir-kê her me-zin a-ta-tirk".

Qerdiyan bazdide pêş û emrê daviyê wê bide;

- Li milê rastê veger, bi meşa normal pêşve...! ta tèn qada meydanê.

- Qawîş bise! Li min veger! Wezyeta lédanê bis-û!

Hemû bi hev re destên xwe dirêji pêş dikin.

Hemû- Emr'ke qomitanê min.

Qerdiyan dest bi lédanê dike. Di destpêkirina lédanê de, her girtî kunya xwe dibêje.

- Ahmet Bilür,

- Ediyeman,

- Emr'ke qomitanê min.

Qerdiyan- Destê xwe bide ser hev. Bi siparî, bi siparî.

Bi emrê qerdiyan, girtî destê çepê, datine ser yê rastê. Û li berê digre. Ji bo derb cigê xwe baş bigre..

- Hihh, ha... haj te.. yek-dudu-sisê... .

Girtî- Ax, axxx, ay dayê... uff...ax!

Qerdiyan- Nekşin.. nekşine destên xwe. Puşt.. hih... hih dikşîni ne, hih...

Qerdiyan lê dide ta li erdê wi digevizine. Û hêdi li yê di vedigere û diçe ber.

Girtî- Mistefa Qaya.

- Muş.

- Emir'ke qomitanê min!

Qerdiyan- Darê xwe çend caran li destê wi dihejine û bi hijd lê dide.

Girtî- Ax, ûüxxx bavo! Üff üyüü...

Girtî- Mehmet Yilmazer.

- Batman.

- Emr'ke qomitanê min!

Qerdiyan- Çavên xwe negre!! Ûla puşt... ka tê bibîni.

Hah... haj te. haj te.. ha, ha...!

Xwin û ofîna girtiyê. Bi ûfe-ûf li destên xwe yê li dest û tiliyê xwe yê bi xwin mêze dike. Di nav axin û ûfnê de sitêr ji çavên wi dibarin. Îske-isk pê dikeve.

Girti- Yilmaz Yucetirk.

- Eleziz.

- Emr'ke qomitanê min.

Qerdiyan-

Lê hêrs dibe. Serê xwe jê re dihejîne. Dar di zikê wi de radike. Tu dike rûyê wi û darê destê xwe dij-dine.

- Ûla pûşt! Destên xwe deyne ser-hev, dirêjke, ha hah... ha yek, ha didu, ha sisê, ha..., hih... maqey nexweşbû? Ne wilo?



Xweydana eniya xwe bi pišta destê xwe paqij dike. Firnikên pozê wi mîna gewriya beqê radi-bin dadikevin. Darê destê xwe davê û bi kulma diçe ser. Wi li erd'ê pij dike. Li girtiya difetile û emîr dide.

- Xwe li erd'ê dirêjkin! bi kişîşînî. Ûla qewad, xwe baş nakîşîşînî. Ji dar tîr nebûyê ne..! Ha ji te ra hah, hihh bisin! Bila pišta we li erd'ê bizeliqe. Xwe bikişîşînî hêji, hêji, bi wiyali va, ha, hahh.. bi aliye di va. Hêji bi mesilin, ha hahh, bizeliqe, bizeliqe. Çe-çibûye ji pišta te!! Na pûşt ew xweydana sore, ne xwîne, serê we ji wê bişkê: pišta we ya bi birin wê kurmi ji bibe: kinc ji wê nemîne li ser we. Lê wunê vê ji bidomînin. Westandin-mestandinê nizanîm, xwîn û birin ser-mer pê nizanîm. Û nebihizim, hahh wilo.. Rabin piya, çibû ji we? Hê win çîma dikevin, hee ka bisin, bisin.. Hê ewê çî bê serê we, ev ne tu tişteke. Haydê! Zû, hazir weziyeta meşê bigir! Veger çep! Rihet, tu erê-erê tu: mîna seha bi hewte...!

Girti- Hew, hew, hew.

Qerdiyan- Nebû, nabe. Ne-bû kurêmin. Ûla pûşt, ma te qet hewtandina seh'a nediye.

Girti- Belê, min diye. Lê, ez ne kuçik'im, Qomitanê min.

Qerdiyan- Ma li te zor hat ne?! Êê. mabû, ma pozê te şewitî. Emê wê ji nerm bikin. Em çî bêjin wunê bikin. Dibi ku hetta sibê tu xwe hinê hewtandinê biki. Haydê, hey tu mîna gura bizûre.

Qerdiyan- Ûûû, ûûû, ûûûûûû

Qerdiyan- Niç, niç, na, na, ne-bû. Ka dîsa bizûre.

Girti-

Bi dengêki ecêbmayî, di nav tîrsê de mîna dengê dika sewtek derxist;

- Ûû ûûû ûûûû.

Qerdiyan- Wusa bi dilşewatî nezûre. Billa horre-hor ji te were.

Girti-

Disa kir ku bi dengêki ecêbmayî bizûre, sewt ji gewriyê derdixe, lê tu naşihube zûrandînê, dike-nake bi kêr nayne;

- Ûû ûûûû ûû...

Qerdiyan- Bi derbek diduyan wi li erdê dirêj dike. Pêl gewriya wi dike. Rab, rabe, ra-be piya ibne! Tu erê tu.. mîna kerê bi bizire.. de!

Girti- Ez nizanîm, qomitanê min.

Qerdiyan- Ma tu li hember dertêyî?!

Girti- Na.., lê, bellê ez ne kerim, qomitanê min.

Qerdiyan- Na lo! Lê hê tu çiyî?

Girti- Însanîm.

Qerdiyan- Na. Tu kerî. Bi zire!

Girti-

Dit ku dar bilind bû:

- Înga, inga, ingaaa!

Qerdiyan- Na. Baş ne bû, nabe. Heta sibê dibi xwe hin-biki. Ka mîna pisika binawe.

Girti- Miyaw, miyaw, miyaww.

Qerdiyan- Haah, eferim. Mêze te çewa xweş got. Hêyy tu! Ka mîna beq'a: qure qur bike. Haydê zû, ne-se...

Girti- Viraak, viraak, viraakaak.

Qerdiyan- Te mîna beq'ê, bêriya gol û çema, av û avzêya kiriye, ne wilo. He, ka çok bide.. Ha wusa. Te li derva tolazi dikira..

Girti-

Gûzeka lingê çepê gihandiye erd'ê û paşve qelabûye. Lingê rast'ê daye pêş, çok digihê singê.

- Beg'm, du jinê min hene, ma minê çîma tolazi bik'ra...

Qerdiyan- Ûlan pûşt. Ma mirov bê tolazi kare bîji? Qiz û jinên mîna rihana li her derî hene. Mîna gotinê di ber girtiyekê de bavê. Ûf, ax, ax ew qor, ax lan ax. Rabin piya, zû rêz bibin. Xwe belotani kin.

Hemû girtî mîna tê gotin dikin, qerdiyan bi darê destê xwe li wan dide dibe qêrin û barîna girtiyan, ax-waxa wan, bi meydanê dikeve. Viyy dayê, ûy dayê peritîm. Ax, axx bavo...

Qerdiyan- Xwe rastkin. Bikevin dorê. Rihet.. Ûla rast bisin. Xwaro-marô nesin. Nexwe ezê diya we ezê rihê we tîxim qalik. Hih, hazir! Li mi veger, ho ho şoş. Ma we rast û çepên xwe ji birkir. Li ali di vedigern. Ho ho ma qey win li çiya ne. Çok bid! Hêy hêy tu, tu çîma wiha şexsi rûniştiyî, rabe piya!

Girti- Di çimê min de, raşitîzm heye. Min nexweşîna raşitîzm derbas kiriye. Lingê min ji gûzekê pêş da na tewe.

Çawişek ji dûr va vi dengî dibîhîze, bi bazdan tê û bi bintengi li hember radiweste.

Çawiş- Çê, çê, çê. Ma te go çê?

Girti- Raşitîzm.

Çawiş- Ûlan ew çiyê, he çiyê ew?

Girti- Gotineka tibbî ye. Nexweşîna hestîya.

Çawiş- Ûla pûstno.. wê hemû tişt û gotinên we bi "îzm" derbas bibe he!

Girti- Ma ez çê zanim. Wilo tê gotin.

Qerdiyan- Na na ne wilo. Aaaha (Kulmek hijdi davêjê) hah hin bibe ica.. ha wiha li erd'ê bi gevîze. Ku tu

hin bibi. Ûla pûşt bê hiş ket... Wi bikişinin quncik. Billa lê israhêt ke.. Ûla hê pûşdê di li ve vezilandiyê. Dibi bi kulma rabe. Hih, haş te ha. Wê çilo be, nayê hişê xwe..

Çawiş- Ka pimpê bine. Rabe Ûla ma ev otêlê? Ma xane?

Qerdiyan- Keremke.

Çawiş- Pêl mid'a wi ke û millên wi bigir!

Çawiş car-bicar devê pimpê dîke dev û firnikê girti û mîna peza bê gurandinê pif dide. Girti hemû bi tîrs lê mêze dîkin.

Girti-

Li hawîrdorê xwe fêdikire, destên we li ser newqa xwe hijd digre.. di nav êş û arincê de di gevize. Çavên wi niv-vekirî, kinc û bedena wi perçe-perçe bûne. Dest û ser, mil û kincên wi ji xwinê sor bûne, wi bi zorê radikine piya, mîna telîseki dikîşîşînin jorê.

- Ha ha wilo çavên xwe veke.. Ûla were hişê xwe wisa ha. Çewa ye te xewnên şerîn dit... Rabe lan! Qerdiyan bigre em wi rakin. Ha wusa, tamam. Ûla pûşt, diyamin bibe jîna mi, ji ve îşkencê mi zewq nestend: Bina min derneket.. Ooho tu nenê-re ez ji ve îşkencê hewqas zewq nastînim. Li min fek're, ez eskerim. dibi heqê va kinca ez bidim. Ne wilo? Haydê dest bi merş'a "Tirkiye" bike zû.. haydê!

Miheme- Zmanê xwe bi zorê dilibîtûne, mîna lala. Min ne-ne xwest. Hin-hinn-ann bim.

Çawiş- Îbne, deme wilo ha. Veke veke destê xwe, veke pûşt, deyne ser hev, deyne! ha wilo qerdiyan ha wilo ti bigre. Bila nekşîne. Ka neha tê bibinin, ezê bi ... dê û xwişkên te ... haj'te. Hih, hih dibi tu hin bibi. Me gellek weke te diye ku digotin em napeyvin, nizanîm min ne diye. Dawiyê, hih haj'te...: hin mîna bilbil xwendin. Neha ji devê wan nayê girtin. Hih, haj'te Ûla îbne, tê bi cihîmî, bi cihîmî. Demeki kurt de dibi hemû marşa jiber ki..

Miheme- Gotinek ji jiber nakim.

Çawiş- Lawo, ev der dibîstana eskerî ye. Te qeydî bendên dibîstanê bi cih bîni. Teres. An ezê te bifetîsînim, ezê te, bû he.. Tê li girtîxanê û li qawîşê ray li hemû qeyd û bendan bîni. Tê li van razî bibi. Dema qomit hat kişandinê destên xwe berxwe va tê berdi. Bizeliqîni. Mîna pût bimîni. Tê mîna kevîrê bê rih û can bisekinî. Mîna robotekî, robot, robot tamam. Mîna robot. Libitandin, virde-wurde tune. Tê bibi robot. Ka tiliyên destê xwe bide hev, rake.

Bi hijd çend daran li serê tiliyên Miheme dixê; xwin ji neynok û tiliyên Miheme dîniqute kefa destê wî. Ka devê xwe veke... Venakî ne! Veke devê wî.. Ha wusa.. hê baştir baştir qerdiyan hêji ha, ha. Veke lan li diranê te mêzek'm. Ne diranê te diheşîyan. Bibime dixtor.

Miheme- Na, naêşe.

Wê gavê qerdiyan ji darê çawiş re darê xwe dîke pêplûk û çawişbi darê, zorê darê xwe tédixê nava devê Miheme. Û çend car bi hijdi li nav devê wî dide. Bê hemd Miheme diheje. Şaş dibe. Êş û zîngîn serê wî digrin. Xwin ji devê wî dinizile erd'ê.

Çawiş- Hih, çi li wan xayînê welat dibe disa ne bese. Li hev çav dişkinî û dertên ber bi derva.

Qerdiyan- Heta ku ez bêm, libitandin ji we re tune ye tamam.

Du kes li hawîrdorê xwe mêze dîkin piştê. Lawo, evê vana me bikujin..! Welew bi saxî em ji ve nafilitin. Ka wilo nebê lo, vi zilamî ji ku dan qawîşa me. Hişş, hêdi bi peyvîn. Deng wê herê, nana nema billa herê. Teres bû bela serê me, nabîni çi tinin serê me. Ji ber çiyê qey? Ka bise, bise.. ka wer;

- Ha heval! Li ve derê, bi serê xwe tu nikarî li berxwe bîdi.

- Bira! Ma qey heyfa te, li te ji nayê? Qene. billa dilê te, li qawîşê, li me bi şewite. Ji ber te em zirarê dibînin. Zîrar digihê me hemûyan.

- Ji sedema te nan û avê nadîne qawîşê.

Bi hatîna qerdiyan ve disa hemû yên girtîya cihê xwe digrin.

- Diqet!

Qerdiyan- Ji bo marşa Îstîklalê hazîr! Rûyê xwe li al'ê bigrin. Hazîr. Hey tu.. rab! Bi kişîşandinê ji rana-bî? Rabe, rabe Ûla, haydê marşa Îstîklalê bi meşe! Rabe lan!

Girti- Tê nagihêm ku rabin, qomitanê min.

Qerdiyan- Ew çi gotîne, têngîhêm ku rabin he! Rihet, hazîr. Hêy tu derkev pêş: marşê bide xwendin!

Girti- Serçava komitanê'm.

Girti dest bi marşê dîkin. Perde tê girtîne.

SAHNE II

Bi vekirîna perdê va, bi hêrs girtîyek davê nava "Hucre".

Qerdiyan- Hah, qurbanekî di. Qaseka di, tê bibîni xayîno.

Piştî qerdiyan derî diqefêle, qerdiyanek; bi qelem û topek kaxîzê bin çengê xwe tê derî vedike, dikeve hundîrê "hucre".

Qerdiyan- Rabîke van û çiroka jiyana xwe b'nivîse. haydê nese, zû... de zû hewqas li benda te me.. zû.

Muhsin- Tiştê nivîsandîye, dixwîne.

- Navê min: Îbrahîm Şenol.

- Sala 1955 a li hêla Rûhayê, li ovacîx, gundê Hilwanê hatîme dinê. Sala 1962 a min li gund dest bi dibîstanê kir. Û sala 1967 a min dibîstanê qedand. Û çûme dibîstana navîn. Sala 1976 an çûm eskerîyê, û sala 1978 an vegeyîyam. Disa min li gund alî bavê xwe kir. Û li kar ge'yîyam. Roja sêşemê disa ji bo gera kar ez diçûm Ceylanpinarê û hatim girtîne. Min anîn ve derê.

Qerdiyan- (Lê hêrs dibe. Ji nişkava dest davêje nivîsê. Li xweşa wî diçe. Bi çavsoî dikene.)

- Ma hewqasan? Na, na te baş tam ji vi dari nestendîye. Haşte.. hah.. başqe te xwar. Tiştê vedîşerî ji binivîsîne. Tiştê naxwazî ji. Haydê zû. Ma çiroka jiyana te hewqase.. hewqas kin û pûç e. Ka tê binivîsîni, na nivîsîni, emê hev bibînin, ji nûh de binivîsîne. Ka bise.. hê ev çîne!

Muhsin- Rastî çi bû: eve. Hê çê binivîsinim?

Qerdiyan- Ka tu li cihê nermijandinê, ji lingan bê daleqandinê, carmixê. Billa jop têkeve ... wê gavê tê bibîni. bi

axin û giri tê bipeyvi. A'na peyivi. binivisîni a na nivisîni wê bêyi ditin.

Qerdiyan derê hesin digre û dertê derva. Li milê çepê vedigere û dikene. Ku dinav tepe-rep û lepên qerdiyana de girtiyekî nûh tê kişkişandinê. Dev û rûkê wî di xwinê de maye. Kincên wî qetandi ne. Ge li piştê siwar dibin, geh wî li erdê di kişkişînin; tinin davên nav "hucrê".

Qerdiyan- Ma tu Merşa Îstiklalê naxwini: li ber al'a Tirk bi pergal nasekîni. dernakevi egîtmê. radikevi he! Teres. Lo tu li çeyên xwe baweri. Çeyê te heye. Lo emê çermê we bigurînin. Min dê. zarû. bav... yo... xayino.. Puştê parvekar. Mirovê bê teşe. Ûla ma qey winê. wilo ji destên me bi fîlitin? Ûla emê we tunekin. Emê we hemûyan qirr bikin.

Dema qerdiyan dertê derva. qerdiyaneki cendirme mase û sendelîki tîne. Muhsin ji hucrê derdixe. Li ser sendelî rûdînine. Vê gavê işkenceci cihê xwe digrin. Di destê wan de, dosya û çiroka jiyana Muhsin heye. Ji hewşa girtixanê, dengên marşa û tepe-repa lingê meşîna girtiya tê.

- Ûla ker kurrên kerana. Xwe dirêjkin. bi kişkişin. rabin. rêz bibin. Rihet. hazir. Li ser lingekî pêş de marş.. bis her kesek li piştê yê pêş xwe siwarê.. marş, bis! peyabin xwarê! bi bazdan herin-werin. Hê zûtir! Ma win. win xayînen welat. Çima xwe dirêj nakin? Xwe naxînin-ranabin? Çima win emra naynin cih?

Tepe-repa dar û nalînan ji xwarê tê. Di bin şiqe-şîqa jopan da dengê girtî tê. Ma win me bikujin. Em gavek ji navêjin.

Qerdiyan- Parvekarna. qomonistna. Wê welat çê ji we hevî bike. Heqê em we hemûyan serjêbikin. bikujin.

Muhsin bi dest û çavên girêdayî li ser sendelî rûniştî. 5-6 kes li hawirdorê wî diçin-tên. Mîna wî bi pîvîn. Ji linga ta serî le mêze dikin.

Yuzbaşı- Li sendelî rûnê. destê xwe dey ne ser masê. Ka dest bi çiroka jiyana xwe bike.

Muhsin- Îfada xwe ya nivîsî bû, ji serî ta dawiyê disa got. **Ha hewqas.**

Yuzbaşı- Te eskeriya xwe li ku kir?

Muhsin- Manisa. Kîşla Rojava.

Yuzbaşı- Ya, wilo ha!

Muhsin- Bellê.

Yuzbaşı- Wiyê bi tera hatîye girtinê ku cizdanekî bi navê Eli Özerden bikaraniye. Lê. dawiyê idîa dîke ku navê wî Bedr Özgüne. Tu di derheqê wî kesî de çê dizanî?

Muhsin- Nasnakim. Rêwîki di rê de li erebê siwar bûye.

Yuzbaşı- Eyye kîye. çi kesê?

Muhsin- Nasnakim. Herdûkan ji tew mi nedîye. Ji xwe imkan tune ku wan ji nasbikim. Lewra ji gund pîr derneketime derva: ta ku van hêllê derdorê xwe ji baş nasnakim. Ji xwe wê rojê ji, bi hevîya ku ezê li çiftlîxa Ceylanpînarê ji xw'ra karek bibînim. Ji mal derketim û çûm Ruhayê. Lê gellek bû derên-

gi. Ji ber ku min Ceylanpînar e baş nasnedikim. çûm ku şevê li vîranşehîrê derbas bikim ku serê sibê zû rabin. bi rê kevîm. fikra min ev bû. Ji ber vê yekê diçûm. Lê min çend cara li ber terminala "Oto şarqê" şofêr li parqê diye. Bi şekil wî nasdikim. Ew kesê win dibên û jinik. li rê siwarbun. Ez li Wêranşehîrê hê li cihê seknoka texsiyê siwar bûm.

Yuzbaşı- Ew kitabên qedexê. belavok û pirtukên hatîne ditinê yê kîne?

Muhsin- Nizanim.

Yuzbaşı- Wîlo he! Lê ew 3.000 Mark perê hatîne ditine. ew yê kîne?

Muhsin- Va ji we dibihîzim.

Yuzbaşı- Dimek navê te Îbrahim Şenol'e he. Çewa jê bawerkim?

Muhsin- Cizdanê min di destê we de ye.

Yuzbaşı- Ûlan ker kurrê kera, tu ne wîlo ye. Rasûyê bêje. Ka bise. Ji binjopa ji nakşîni destê xwe ne zû zû wî ji erdê rakin. Ka wî li pelegoşka xwe bibîne. Wê gavê dînya çewa ye tê bibîni. Hih deng ji der-naxî ne.

Çiqas mîaş ji Apociyan distîni. bêje çiqas? Talimat û emra ji kî distîni? Çend kesan kuştîyî? Bêje.. bêje Ûlan te zmanê xwe xwar!

Muhsin- Ti kesan.

Yuzbaşı- Kijan Apociyan nasdikî?

Muhsin- Nasnakim.

Yuzbaşı- Kingê bûyi endamê Apociya.

Muhsin- Ne endamim.

Vê gavê êrişê ser dikin. Ji kulm û pîhîna, ji jip û daran **Muhsin** bêhiş dikeve. **Qerdiyan** û kesê di, bi qevdikê şalê wî digrin û bi kişkişandinê wî davên hucrê.

Yuzbaşı û kesên din dertên derva.

Qerdiyan- Ha li vê bi cihîme.

He ji hewşê denge girtîya u emrên qerdiyan ten. Bîs.. dido-dido veqetin. Çen hev u du bikin. Ne sekne.

- Qomitanê min: çer... ez... ez...

- Ûla heywan kure heywanan destpê kin.

Li hucrê bere-bere hişê Muhsin tê serî. Li hawirdorê xwe mêze dîke. destê xwe davê qelşa serê xwe. Xwîna ser-çavê xwe paqij dîke. Û hêdi-hêdi ji xwe dikeve peyvê...

Muhsin- Dîbi ez pê zanîm ku şoreşgerêkî li herderî û di nav her hoyî de herdem xwediyê îrada xwe be. Mîna her hevalê xwe ez ji li ber imtîhaneka mezînim. Li ber her ihtîmaleka hundur çî dibe-nabe dîbi ez xwe hazîrî her tiştî bikim. Piştî wê jî, di çê hoyan de dibe bile be, bi işkencê li ser îrada şoreşgeran nayê hikimkirinê. Dîbi ku ez nekevim tîrsa canê xwe. **Hewqas xwar nebim! Biji Serxwebûn, Biji Enternasyonalîzm, Biji Partiya Karkerên Kurdistan.**

Muhsin hêdi-hêdi bi dizî bi dengêkî sivik bang dîke hucrê jor û jêr. Car bi caran li diwar dîde. Dixwaze hin tişt hin bibe. Kîne yên li hucra. Kîne yên li hucrê jor... kîye li hucrê rast û çep? Hevalno! Deng bidin.. deng... her hal li işkencê ne, an ji deng naçe wan.. kîye? hevalno kîye li hucran?

(Dûmahîk heye)

HOGIRÊN HÊJA!

Li mahkemên Kurdistana-Tirkî-ye yê ku hê tene ditinê, berê; tenê ji alî karbidestên mahkemê va dihat idîakirinê ku gelê Kurd tune. Zmanê Kurdi, zmaneki lihevhati ye. Û Kurd ne xwediyên wêje, çand û sin'et'in. Lê, niha dibin nirên qolonyalîsta faşîsta cunte de, ji faşîzmê pişt dibinin, ji xeyni sawci, dadgêrên mahkema ji berî ku biryar ji bê danê, hê ji domandîna mahkemê de di derheqê nebûna Kurda û zman, çand û zmanê Kurda de idîanê tev-lihev diparêzin.

Dibi ku diwarên mahkema bibin cihgera politîka me. Mina tê zaninê, dema DÎMÎTROV î mahkemekirin; Dimitrov di mahkemê ji sawciyê jê ra dibê "gelê Bulgar tune", vê bersivê didê: "Serdarê Prûsyê, min zmanê Almanî tenê bi hespên xwe yê bezêr ra dipeyivî" û hebûna gelê Bulgar daxuyan dike. Û ev gotin ji hemû hogiran re bûye rêber.

Ez vê vejandina kurte-birî, di derheqê çanda Kurd, sin'et û wêje û zmanê Kurd e pêşkêşî we dikim. Ev nivîs, bi çî awahî, çanda gelê me ji alî hêza zorbazan ve hati ye pejrandin, bi danezanên nişane daxuyan dike. Bi pêşkirina nivîsê amancê ku ji doza me ra xizmet bikim. Nexasim li hember sawci û karbidestên qolonyalîsta bê parastin û ji derdorên mahkema ev yek bigihîje hemû hêllan. Lewra a pêwîst doza me ye...

Ez vê nivîsa xwe ji biranina hogir MAZZUM DOĞAN re diyarî dikim. Ku ew dibê «Amancê dewleta Tirk e ku, gelê Kurd tunebike. Mahkemên li Kurdistanê ji hebûna dewleta Tirk re (ku evana sazgerên dada Tirk e) destikin. Cezayên ku mahkema bidin; ji cezayên hêllên sinoran; çiyayên Kurdistan, deşt û bajêran, û ji yê gund û taxan ku ji beşera mirovî pêştir tu sûcê wan nine, ji cezayên li ser sedan lawên Kurdistanê tê kirinê, ji van cezayên hov û nemirovî diwartir ninin.»

Bi qedr û silavên şoreşgerî.

LÎ NAV NETEWA KURD TESÎRÊN WÊJE, ÇAND Û SÎN'ET

BÊŞİK. yekê ji taybetê hebûna netewa dide nişandanê ew ji sin'et û çand e. Vê; Lenin dibêje ku; ji gel ra pêvajoka gihana netewbûnî, ji yekitîyê, ax û çand û zman diafire. Disa li gohra Lenin daxuyan tîne, ger çanda komci-vakek tune be, netewbûna wê komci-vakê ne mimkun e.

Gelê Kurd, hê li ber banga diroka beşerî li rûyê dinyayê, bingehê bizra çand avêti ye. Di vi alî de netewkî yekemin e. Ku gelê me, bi hebûna xwe ya diroki, 300 salan berî miladî, kêrî medeniyeta dinyayê hati ye. Filozofên Rojava ku di cihanê de bi nav û deng in; destpêka medeniyetê digihînin kufşkirina tekelekan. Pêkanîna destikên gerê ji abûrêran bûne sebebê pêşketinê. Başê; komci-vaka tekelekê medeniyetê gerand û ber bi vê amancê va dibezîye, kijan komci-vak e?

Nivîskarê bi nav û deng yê Îskandinavi GRÏMBERG tîne zman ku neqla ewilî Kurd'an hespê kedikirine. Û ji bo bar û siwariyê xebitandine. (1), (2).

Di mintûqê de bi vi awahî gelê Kurd imkanên gerê bikar dike, digihe dewletî û ji bo pêşketina tîkiliyên abûrê, rêya ber bi netewbûnî jê ra vedibe.

Ji behra Hezar, delava Basrê, ta Îskenderûnê û ew cîyên ku bi Anadolê tene zanin, li van derên fireh û li gellek cîyan, ji 5 000 salan ve ye ku di van erda de, hebûna xwe didomine û xwe di sitirine. Mina netewayên serdest, bêdadî, pêkanînen nemirovî, qetliam û êrişbaziyên li serê karhatîne, tenê gelê Kurd xasiya xwe parastîye û mîna wana, zerp û pêkanînen nemirovî bikar neani ye.

Ji ber Kurdistan di nav-bera Asya û Ewropê de mîna pirekî çih girûye, ji sedemê vê yekê ji gellek qewmên êrişkar, hov û xwînrijan re bûye cihger. Ji sedemê gellek yekan, nexasim ji ber vê rewşa dijwar e ku gelê Kurd dembidem xwe kişandîye hêllên çîyan. Bê guman ev rewş li ser civaka Kurd tesîr dike. Û gellek neerînen vê rewşê hebin ji, di hoyên dijwar û guhartî de destkeranin pêş de diçe. Li ser sin'et û hwd. tesîr ava dike. Bi hatin û êrişên koçberê Asya'yê, ber bi Anadolê rêdikevin, û pejrandinan bikar tînin. Lê,

her ku çiqasan sin'et û danezanên çanda Kurd hatibi pejrandin û gellek ji wan hatûbin tunekirin ji, ew qewmên Asyatîk bi demê di nav qewmê erdgirtî de dikevin binê tesîra çand û sin'et'a Kurda û di navê de di helin.

Nexasim; dirokniwîskarê Yekitîya Sovyet Griyên pêvajoka tesîr girtinê ta digihine berya dema qewmên hov. Û wiha dibêje; «Gelê Kurd, berî Iraniya wêje û nivîsa Asûra zanibû. (Bi rastî, Asûrî ji wêje û nivîs ji Kurda hîn bûne (y. nivîskar). Kurd ji Med'a ne. Anî Mar'a li ser kevîran nivîsandin û pût'a çêkir. Piştî ku Îran'a (Fars) Med'a binxistin pê de Guros, wêje û sin'et'a Kurda bikar ani». (4) Bi van ji, êşkere dibê ku gelê Îran, wêje û dewlemendiya sin'et'a gelê Kurd, miras sitendi ye.

Kuîrojî li hemû derên Anadolê, li Sûrî, li Îraq û li Îranê ku van civakan gihane dewletî, li ser van civaka tesîrên folklor, çand û sin'et'a Kurda tene ditinê. Çînen serdestên civakan, hêzên emperyalîst û hêzên qolonyalîst, ji alî siyasi ve Kurdistanê ji hev parvekirin e, bi vê ji tîrname çand û sin'et'a gelê Kurd ji hev pejrandinê, politîka asimlasyonê bi girani li ser vi alî bikar anîne.

Lê, ro bi heriyê nayê sihandinê. Ji 5000 salan ve ku li ser vi erdî, sin'et, çand, mîmarî, sin'etên xweş, xemlandin, wêne, heykel, muzîk, sin'etên desta, û ta (gastronomiyê) sin'etê kilerê, gelê me sitrandiye û ji netewên serdest ra bûye rêber.

Emê di vê nivîsê de rastîyan, li ser nêrin û danezanên biyani bi rêz bikin û bidine nişandanê.

BAWERÎ Û REQS

BAWERÎYÊN OLPERESTÎ li ser beşerên —ku di ilim de bi determinîzm tê navdanê—yani; ew dema tariya ku dema navberan vejandina bûyera ji rexê bûyeran tê kirinê, tesîr ava dike. Ev rastî, ji berçavan nayên dîrkirinê. Kurda ji demên baweranîna rojê, hiv'e hwd. derbas kirine. Mina ku Bazil Nikîtin dibêje; «ji xeyni baweranîna misilmanî yê gelê Kurd,

bêşik ji alê xwe va, taybetên xwe yê xas sitirandîye û taybetên xas afirandî ye. Di vi ali de, rewşa xasî ji ber çavan nayê avêtinê. (Mîna êzdîtî) Di vi ali de taybeteka xas digrin. Qena gelê Kurd di vi rexi de ji xwe ra bi her awahî rê û karanînek pêkanî ye»⁽⁵⁾ Bi bişkavtîna Nikûtîn ji êşkere dibe ku: baweraniya misilmaniya –ku ne demî ye– gelê me wê li gohr pêşketîna xwe bikar anî ye û daniye cihki ku lê tê û di vi ali de kêrhatîyê vê yekê bûye.

Hê demên berê ku olperestî perçek ji jîyanê ye gelê Kurd xwe ber bi dîtî û baweriyên lihev-hatî bernedî ye. Bellê qedexeyên ku sistema misilmanîyê anîye, di nav vê rewşê de gelê Kurd, sin'et, reqs û muzîka xwe li piya hiştî ye. Wêne yê şer'a, xezal û mirovan û wêne yên tawûz, li ser xalî û merşên xwe nexşandî ye. Pûtên ku li Ûrartû, Mitraîzm û li Niniv'e hatine dîtî, îro muzeyên dinyayê dixemilînin. Îro di nav danezanên nişane de, li muzeya Berlin'e esereka qeşartî dimîne –ku ya keç û kralê Kurda, Kassîet e. Ku keça xwe ji xwedê ra qurban dide– Neha li muzeyê cîyêke bi nişane digre. Ji berî misilmanîyê hezar salan wir de xebatên sin'etî destpê bûne. Di nav hewqas qedexeyên dijwar de, di sa gelê Kurd xwe ji xebatên muzîk û reqsê negirtî ye. Eslê wî Afganî be ji, ji ber ku mewlana, çar salan li nav Kurde Erzincan'e maye, Bazil Nikûtîn di kitaba xwe (Kurda) de toreyê sema daxuyanîne ku ji "Yêzdîtî û Zerduş-tî" sitendî ye. (Jiyana wî ya wê hengamê û mayîna wî ya 4 salan, mîstêşarê berê yê çand û berpirsiyarê muza mewlana Mehmet Onder û xweşîroşê (eslê wî Kurd e) nivîskarê rojnama 'Tercüman' Ahmet Kabaklı, di kitaba xwe ya 'MEWLANA' de bi xwe eşkere dikin.) Îro ji sema bikar tên. Û di nav gelê Kurd de didomînin. Mîna B. Nikûtîn daxuyanî dîke, ev ji Kurda hatîye girtin⁽⁶⁾.

Dema ku sema pêk tê, navên tene xebitandinê, Mutrip, Derwîş, Bender, Cem, Dergah û hwd. ev tê zanin ku ji zmanê Kurdî tên. (Fêrhega Tirkî û Kurdî ya Yûsûf Zîya Paşa, werger û rêzvan, M. Emin Bozarlan).

Ji hêla wezîrê çand û turîzmê va bi navê örf û edetê Tirkî ev rastî rê veşartinê. Û bi çanda Tirkî tê naskirinê. Ku ev reqs û muzîk ya gelê Kurd'î. Bi destê dewleta Tirk, vê çanda dewlemend sedcare ku li Îngîlterê, Dani-

marka, Îtalya û li Kanada tê nişandane. Ji hemû hêl û hunermendan rastî tê veşartinê. () Bi rastî, burjuvazîyê Tirk li gohra şoveniya tewrên qolonyalistîya xwe gotîna Kurd nayne ser zmanê xwe. Û yên vê li ser zmanê xwe dilibitînin mîna Î. Beşikçi xelata wan ceza ye.

Îro di radyoya Tirkîye de, gotîna meqamê (Kurd li hicazkar hemû kesan dibîşîrîne. Û hewqas ji têdixê gumanê). Ji meqamên muzîkê, huseynî, nihavendî hwd. ji hêla hunermendên muzîka Tirkî de ji tê zanin ku ev meqamên muzîka Kurdî ne. Di muzîka Kurdî de gellek enstuman ji hatine xebitandinê. Ku di vi ali de ji çanda Kurd dewlemend e. Nexasîm yê ku Ahmedê Xanî, di diwana "Mem û Zîn" de nivîsandîye. Wek:

SAZAN MİRÎ KİRİN WEKÎ SÜR
KÛSÛ DEF Û KÛRRANE Û NAQÛR

di bendê de xuyaye Naqûr, Kûrrane ji orjinalên enstumenda Kurdî ne.

Dema Tirk Anadolê têdixin destên xwe, em dibînin ku di serî de ray li muzîka Kurd û Ermenîya û Erebatînin. Dema sedsala XIan de bi koçerî diherikin Anadol'e, piştî dest ji koçerî berdidin, li erdê cih digrin pê de li ser muzîk hwd. disekinî. Û bi giranî ji yên civakan tam distînin. Lê, yên naxwazîn vê rastîyê bibînin derketîne.

Profesorê dîroknîvîkarê Yekîtîya Sovyet HALFÎN, ku berpirsiyarê dîroknîvîkarê burjuvazîyê rojava, paravane qolonyalistîya Brîtanîya CURZON dema dibêje, «*Diroka Kurda nayê zanîn. Bi texmîne ku ev netew; bê dîrok û bê wêje ye*» ji ber deqa reqsê dide biranîne ku neha vê yekê mahkemên qolonyalîstan pêktînin, profesor Halfîn vê bersivê dide «*Nexasîm diroka Kurdistan'e ya dema nûh jar hatîye ronahîkirinê. Nivîskarên burjuva di derheqê Îskender'e Makedonî û li ser 10,000 Gîreki, ku di Kurdistan'e de derbasbûne bi cildan kitab nivîsandîne. Lê di derheqê diroka Kurdistan de tu xebatan nekîrîne. Nexasîm ji di derheqê sedsalên XIX. û XXan de –ku li hemberê zilm û êsîrîyê gelê Kurd, tekoşînên mezin û qehremanîyê bi şan nişan daye– gellek tişt jar hatîne nivîsandîne. Ta ku rastîyê bi zaneyî neanîne zman, neximandîne.*»

Ya rastî ji, dema generalên faşîst, sedhezaran kedkarên Kurd, keç û jîna, dergûş û rûsipîyan bi bédadî di

qetliaman de derbaskirin (mîna Dersîm, Zilan, Axrî, Qoçgîrî hwd. pêkanînen li keç û jînan tê kirin. ji kitaba Nûrî Dersîmî bixwî). Mûkê van nivîskarên ji ne hejîya. Hêzên qolonyalist û berdestkên wan, Ermenî û Kurda di qetliaman de derbaskirîne, jenosîdên eşkere pêkanîne. Lê, bawerî û çand û zmanê Kurd li piya ma ye. Di 'Îhtîyat-i Kuvvet Millîye' de, di derheqê vê yekê de Dr. H. Kivîlcimlî wiha dibê «*serekî gelê Kurd heye (serê Kurd) ku, ev ser çîqas bê tarîmarkîrî, mezin dibe. Çîqas bê jêkirin hewqas dişuhbe serê ziyayên çiroka...*»⁽⁷⁾.

OZAN Û MUZÎKA GEL

OZNAÎYA GELÎ, ji perçek çand û sin'et'a Kurda ye. Ozanên gelê Kurd ji sedsalan ve ye ku di cejnên Newroz'e, dawet û şevên çîla, û di şevbêrkên gunda de sin'et û hunerên xwe yê, rexne-berî, pezîndan, xweşkirin û helbesvanî derdixîne meydanê. Ku ta carnan di hembergotîne de ozanên bin dîkeve destikên hunera xwe ji hemberê xwe ra datîne erdê û dest jê berdidê.

Ozanêkê ji der-dorên gund were û li derê rûniştîne dest'ka hunerên xwe li diwêr daleqîne, ev bi ozanên gund tê manekirin ku li hemberî wan meydanê dixwîne. Li ser pêşketîna hunera ozantîyê tesîrên vana hene, ku ji Gutîl'a, Kassî'a, Ûrartû û ji Med'an ve, gelê Kurd tora xwe yê sin'et'î meşandî ye û toreyên zerdûsî û êzdîtî, bi misilmanîyê ve ji; toreyên alevîti û şîitî tesîrên civakên reqs, muzîk û gotebêjî çêbûne. Rola van yekan ji hebûn e.

Ozanên gelê Kurd, di şerên rizgarîyê de ku di berxwedanên hember dijîmî de şehîd bûne, li ser şehîd û şervanan helbestên pêwîst afirandîne. Û van kirîne malê wêjeya Kurd. Ji dîrokê hejmarên ozanên Kurd gihaye hezaran. Lê helbestên wana ji ber zerpên dijîmî û nîrê qolonyalistî û talanbazîyê negihane wêje ya nivîsî. Ji hev pejîrîne. Û pîranîya wan wunda bûne. Ev wundabûn, tenê ne ji bo wêja Kurd, ji wêja dinê û diroka beşerî ra jû wundabûneka wêjenî ye. Ji ber vê yekê barê giran evê ku; gund-bi gund, mal-bi mal, sin'et'a dewlemend ku di hiş û mejiyên porsîpîyên Kurda de maye bê kêmasî, taybetên folklorî Kurdî, çîrokên gelî, efsane û helbestên li ser şehîd û qehremanên gelê me derbûne.

bêne komcivandinê. Ev kar, kareki pêwîst û giran e. Lewra dem asê û kine. Hêzên qolonyalîst hemû destikên xwe, li her gundi radyo û televizyonê xwe bi cih kirine, amance ku taybetên di hiş û mêjyên gelê me de, mane tunebikin. Nexasim li ser vê, bi dijwari disekinin. Û lewra; komcivakên xwedî li çand û sin'et'ên xwe der'ne, hatin û civandin û rabûna wê ne mimkin e. Pêkanîna komcivandinê wê balla, sin'et û wêje nasên dinê ji bikîşi ne.

"Dewlet heta neha li ser ozanê gel nesekîni ye. Û ji bo wan, qet xebat nekirine, ev xebat nehatine dîtinê. 600 salên dema împaratoriya Osmanîya, 46 salên dema cîmhûriyetê nêzi ozanên gel nebûne. Ji bo pêşketina sin'et û hunermendiyê tu alîkarî ne dîne..." Xwediyê van gotinan, endamê mahkemê anayasa Tirkîye Ahmed Erodğdu ye. (Rojname Cumhuriyet, 1980-Sernivîs: Xebat û Ozanên Gel). Ev kivşkirin rast e. Lê, sedemê wê nehatîye bişkavtinê. Lewra kaniya sin'et'ê ku tê zman, çand û sin'et'a Kurdî ye. Pîranîya helbestên gelê, ji ye gelê Kurd, Ermenî û ji welatên Balkana hatine sitendîne. Û gotinên wana hatine guhartinê. Bellê, helbestên gundi û kedkarên Tirkî heye. Û gellek bi rûmetin. Lê çand û helbestên Kurda, bi navê Tirkî tene guhartinê û bi vi awahi tê diyarî. Ev tewrên zorgirtîya ye.

Li Tirkîye ji hêllên Diyarbekir, Ruha, Wan, Dêrsim, Qers ta derdorên Siwas'ê helbestên Kurdî tene civandin û bi zmanê Tirkî tene weşandinê û cihên serî digrin.

Bi vê nivîsa Kurte-birî, rêya vekirina hemû şaxên huner û ozaniya gel nîne. Lê, emê ji helbesta Alîşer ozan, û qehremanê nemir, bendek bistinin. Ku helbest ji devê gundi û kedkarên Kurdistan'ê, ji nekxa şoreşger û şervanên rizgarîxwaz dernayê li vê rêz bikin:

"Dilo yaman yaman yaman
Çiyan kirto berfo dûman
Mera bisin sahi merdan
Ev dernavê hemû derdan (*)

Ji wêjeya Kurda em dixwazin ku li ser şaxê kilam û helbestan ji bisekinin. Ev helbestên ji hêlla kedkarên Kurda ve, di jiyana kar û civatî de tene zman,

di literatora Kurdî de cîyekî xuyane digrin. Ev gellek bi nave ku li hêlla Ruha, dema jin dan di kutin, darên destên xwe bi nîzami li dan didin û di berê de helbestan dibêjin. Û ji çar alîyan ve karên xwe didominin. Kedkarên Kurd, di jiyana kar de mîna helbest û hunermendî kiribe, adana xweydana xwe û vê pêkanî ye. Ji ber ku qurna wê digihîje destpêkên demên berê û dibe nisana gelê Kurd ku ji wê demên ve domdarê jîyanê ye û ji ber şervaniya gel danezandin dide, emê kilama keça çirîkî jê bendek pêşkêş bikin.

*Dolavê dari dê re, dari dê re
Deng tê dengê dolavê
Dolavê dari dê re dari dê re
Tirphîne û girphîne dolavê
Di rêsim herîya jê re, herî jê re
Deng tê gengê dolavê
Di rêsim herîya jê re, herîya jê re
Tirphîn û girphîne dolavê.*

Ozanên Kurda tucar ji caran ji bo şehîd û qehremanên Kurda re bi şai negotîne, helbestên peznê nivîsandine. Ev taybeteka ozanên gelê Kurd e.

Ku, li Şemdîna, li hemberê dijmin, piştî qehremanî û mîrxasiyên nişane, Heyder'ê kureysî şehîd dikeve. Dûrsin'ê birayê wi li serê helbest dinivîsîne, û bi muzîka Kurdî xeml dide.

"Şemdîna, şemdîna habê şemdîno
Durs vano, bra sa Heyder, serkho
va dare
Tic biya sirine tîfank erzîno
Sa Heyder vano, bra Durso pero de
ma perdodine
Ba dewletra, mare par ve cîno
Durs vano, bra pare tirk perskennay
Fincana kafadi, jero ne simîno
Pane, pane, sa Heyder pane" (*)

Li nava gelê Kurd, ji mirinên bo welat re nayê eşandinê. Tucar nabin sebebên eşê. Ji ber ku, dora vê hatîye, bi kurte-birî ve yekê pêşkêş bikin ku, sala 1927an, Nûh'ê Huveyt û ji xweşmêrên Kurda Îzet û Sadiq li hember eskerên Tirk dikevîne şer. Ji sedemên vê yekê xwişka Nûh: GULNAZ'ê digrin û dibin Mûş'ê. Di dawîya hemberiyên giran de, birayê wê Îzet û lawî wê Sadiq şehîd dibin. Generalên dest-

bixwin serên wana jêdikin û dişînin Mûş'ê. Gulnaz'ê ji girtûxanê tînin ku serîyan bi wan, bide naskirinê. Gulnaz'ê pêşi li ber serê Îzet dise û xwe xwarê erdê dike. Û ji bo tekoşîna gelê Kurdistan mîrxasiya Îzet tîne zman. Dawî, li ber serê lawê xwe radiweste. Destên xwe dirêji porê serê jêkirî dike û çavên wî maçî dike. Bi dengê bilin: «Vîya beranê min e. Min, ji bo vê rojê şirdaye lawê xwe. Min ji bo Kurdistan'ê ger kuştîna wî nedîya, minê şîrê xwe lê heram bikirana». N. Dersimî piştî bûyerê pêşkêş dike, rûmet: û taybetên jinên Kurdistan'ê bi vê gotina pêşîyan, gotinên xwe girê dide: "ŞER ŞERE, ÇÎ MÊ YE, ÇÎ NÊR E" (Diroka Dêrsim, R: 229-230).

LEYSTİKÊN GEL

HELBEST û folklor û leystikên gelê me ji der-dorên Erzîrûm'ê, Qers'ê, Bedlis'ê, Mûş'ê, Elezîz'ê, Bingol'ê, Dêrsim'ê, Wan'ê, Ruha'yê û ji hêllên Diyarbekir'ê ji aliyên karbidestên qolonyalîstan ve tene pejrandin û talankirinê. Û mîna folklor û leystikên Tirk tene nişandanê. Nexasim, ji salan va ye ku folklor li welatên Ewropî didine nişandanê, nivîskar û berpirsiyare kovara folklor Tirk derdixe, İhsan Dînçer li Almanya ye ji kesekî ku bi rojnamevani nazdikirê wiha dibê: «rastîyê em binin zman. Bi sayên leystikê gelê Kurda ye ku em, gellek caran li Ewropê biserketin e. Çiqasan em bêjin ku evana leystikên ji kaniya folklor Tirk e ji -bi bêjin-nebêjin ji-hunermendên Ewropî, Emerîkî û Asyayî, bi rastîyê zanin. Nexasim, sala buhuri li Frensa, me sereki qezenç kir. Lê, leystikên (folklor Kurdi) ku xelata zêr sitend, di rojnamên Frensi de daxuyan bû ku, ji folklor û leystika Kurda ye. Em lê şaş man...» Rastîyê li xwe datîne. Lê, hebûnên milletekî, mirov li xwe bigre ji nemirovî bixwe ye. Leystikan ku bi hayhuyî, bi şûr û mertal tê leystandinê, ji ber şerxwazî, dijberî û êrişên Timûr, Atilla û Cengîzخان, didine biranînê, ji aliyên Ewropîyan ve dijberî dikşînin. Ji ber vê yekê, bi fermanê wezîrê derwa û bi raya wezîrê turizmê ji nav leystikên diyar dibi biyanan rakirin. Yek ji talana rasûya çand û folkloran Kurda ev e.

Taybetê leystük û folklorê Kurda ye ku ji xeynê rewşa muzik û deng û reqsan. her leystikeki li ser taybetê civakê pergal girtû ye. Û rewşa civakê tînin zman. Di van leystikan de jiyana mala civaka Kurd, efsaneyên di nav gel de cih girtine, çirok, bûyer û biranina qehremanan û hwd. ev leystikên folklorê Kurd tînin biranin. Ger leystikên gel, baş bêne vejandin, ewê xêza leystik û folklorê gelê Kurd ji derbikeve. Ev rastî dibe niqtakî ku gelê Kurd ji refa Îndo-Ewropî ne. Lewra di leystikên gelên Îndo-Ewropî de jî leystik ji çepera reqs û muzikê derbûne di hemûyan de, jiyana malê, yan jî bûyêrên civakê têne jiyandinê.

Li ser çand û sin'et'a Kurdan di serenava bibliografya de me dû kitabên dit. Lê me eslê wan peyde nekir û ne vejandi ye. Yek ji van: ya nivîskar Dr. Mokri Keywanpour e. (Sitranên Kurd, Tehran, 1951). Ya din a nivîskar Bois Thomas e (Di Şewqa Leystikên Geli De Rihê Kurdan. Paris, 1946).

ÇÎROK Û DESTAN

TAYBETEKA wêje û sin'et'a gelê Kurd di metelok û çirokan de xuya dibe. Ji berî dema Osmaniya ve wêja Ereb û Farsi şerdest bûye û li serê nivîsandinê berdewam bûye, gellek hebûnên golklora gelê Kurd bi devkî xwe gihandine rojên me. Ji ber tîm li ser zmanê Kurdî afirîne, taybetên Kurmanci yê ne guhare jî bi xwe ra anîne. Ji bo vê yekê gellek bi rûmetin. Ji kesên van bi devkî neqil dîke ra *racon teur* tê gotinê. Ku destana qarnewala Finlandî jî van kesan hatî ye

civandinê. Li nava gelê Kurd jî, ger dengbêj an gotebêjên di efsan û çirokên gelî, wêjeya gel, jî sedsalan ve anîne ta rogen me û di nav salan de afirandine. *Memê Alan* di vî alî de destaneka bi nişan e. Îro jî di nava gundên Kurd de di nav dê û bapirandê gellek *'recon teur'* xuyan dibin. Profesorek jî salan ve ku di nav gelê Kurd de çirok, kilam û destanan bi hurbijari kom dîke. Û yek jî vana di bantê de heftûkî derdewam dibî.

Bêşik, ev profesor tê nafikirî ku ev jî wêjeya gelê Kurd in. Û kurd bûna van kesên jê re gotine jî, nade berçavên xwe. Ev di hişên wî de derbas nabin. Û li gohra wî, Kurd yê li çiyân dijîn û tûran'ên. Tiştên hilbijartî ye jî dîbi ku asimle bibin û bi navê çanda Tirk bêne weşandinê. Ji 60 salan ve ye ku li Kurdistanê yê hebûna folklorî ya gelê me dicivîn (Ku evlatûn Cem Guney jî taybetên folklorê Kurdî bi navê ya Tirkî weşandi ye û talanbazi kirî ye. Û jî hêlla qolonyalîstan û li derva xelat sitendî ye. Ji bo vê yekê dewleta Danmarkî xelata wêje dayê.

Lê, wê dema hatine biryar dide. Ne mahkemên talankir, pejrandar û talanbazê çandê û ne jî mahkemên jî sê kesan saz dibin. Wê civak û gel biryar bidin. Lewra talana çanda dewlemend, naşuhûbe talana xezina zêra! Eslê wê ya kîjan netewa be jî, talan xezina çandê dişuhûbe dizîya hember mirovî. Û çand û folklor a kîjan gelî be pê tê biranin û pê ra dîji... Dizekên eynika çanda Kurd dizine, dema lê mêze dikin pê ra dizitî û dizekiya xwe dibinin.

Dirok nivîsarên çand û wêje, yê biyane, çan û wêjeya Kurd, divejînin. Bi navnasiya Kurd, bişkavtinên

xwe daxuyan dikin. Ger jî vana çend misal bêne nişan danê:

1. Nerin li ser wêjeya Kurd, 1955 Al-Machrik, hej. Nisan û Adar.
2. Çirok û destanên Kurdistan, 1946 Grunel A.G. Paris.
3. Nerin û çirokên Kurda, 1860. Jaba.
4. Berhevokek ji şairên Kurdê Sovyet, 11939. çap, 2. ya 1953.
5. Çirokên Kurdî, 1856 Chantre Ernest-Saint-Petersburg.
6. Çirokek Kurdî ji hêlla Sêrtê, 1910. Dufresne.
7. Kurtînvîsên Kurdî.
8. Ji Kurdên Rojhelata Kirmanşahê, destan û helbestên nimûne: Mann Oscar, çapxana Georg Raimar-Berlin.
9. Metelokên Kurdî derheqê heywanetan de, 1922. Basil Nikitin. Londra.
10. Metelokên Kurdî. B. Nikitin û Soane.
11. Gotinên pêşiya, 1936, Paul Marguerette, Paris.
12. Bi zarê hêlla Bota, berhevoka Kurdî, çirok û Kilam, Socin Albert.

Bi pirane, me kitabên ku zû ve derketine navên wan da. Û tenê van daxuyan kir. Başê jî bo bî? Ji bo, daxuyan bibe ku berî jî hêllên qolonyalîstan ve bi girani bêne pejrandinê ku li dinê û di nav cihanê de têgihîştina çand, sin'et û folklorê gelê Kurd pêkhatî ye. Ku piştî van kitabên bi hezaran nivîs hatine nivîsandinê, dewlemendiya çand, sin'et û folklorê Kurd, dane zanandinê. Û ev kitab bi gellek zmana çap bûne û di nav wêjeya dinê de cihên bi nişan digrin.

Dûmahik heye

JÎ KURDÎSTAN' A BAŞÛR

Mîna tê zanin ku; berberiyên li hêllên Rojhelata-Navin di navbera hêzên şoreş û dij-şoreşê de pêktên, dijarî û giraniya berberiya hêzan; bi tekoşinên germ û berberiyên tuj û eşkere, li ser Îraq'ê tene meşandinê. Ev hêllê bûye girêka berberiyên. Berberiyên hêzan xwe li vê derê girtin e. Hêzên dij imperyalizmê, hêzên pêşveruyên hundur û der, li hemberî rejîma berdevkê paşveruyên mintiqê û destika imperyalizmê li dijî diktatoriya faşistê Sedam şerek eşkere di dominin.

tinin. Yê ji berê hebûn ji, ji nûh ve tevgersaziyên xwe pêk tinin, pêş de dibin. Rêxistinên hemberî rejîmê, di nav-berên xwe de, sef-bisef cebhena avakirine, û li dijî rejîmê tekoşina çekdarî dimeşinin. Ji van cebha yê xuyane "Cebha Watani Demokrata Îraq", "Cebha Wetani Demokrata Netew Îraq" û cebha ku ji aliyê Îran'ê "Cebha Îslami" ne.

Hêzên hember rejîma Sedam; ji bo piştgirtiyên bi hêz û fireh pêk bûn di nav-berên xwe de xebatan dikin. Di

Zawit'ê kemîn vegirtin. Sereskerek û 9 esker kuştin. 3 esker birîndar kirin. Ereba dijmin pejirandin. Dîsa li nêzî gundê pebiznê li nav-bera Dihok û derebûf'ê di ser rê de kemîn vegirtin. TIR û erebek polis kete kemînê û hatine şewitandin. Yuzbaşiyek û du çawiş hatine kuştinê. Şoforê TIRê birîndar bû.

- Şeva 5.1.1983a, pêşmergan li Musul'ê taxa Bab El-Şems'ê bimbe avêtin cemsî polîsan. Du polîs kuştin. Polîsek birîndar bû.



Şerê navbera hêzên pêşverû û paşverûkên Rojhelata-Navin li ser girêka Îraq'ê kom bû ye. Li vê hêllê bersiv xwe bi dijarî sipartin e. Paşverûkên Rojhelata-Navin mîna Emîrên Ereb, Suûdî, Urdun, Misir hwd. bi hemû hêz û destikên xwe piştgirtîya rejîma Sedam dikin. Hêzên hember û sazûmanên pêşverû, mîna Sûrî, Libya hwd. li dijî rejîma Sedam tekoşinên eşkere dimeşinin. Ku bi hêzek dij-Emerîkî rejîma Îran'ê li Rojhelata-Navin afirî pê de; ji du salan ve ku bi Îraq'ê re di şer da ye. Û vî şerî hê didomîne.


Li Kurdistan'a Başûr û li Îraq'ê gellek rêxistinên Ereb û Kurdan di derdora tîkiliyên bi van hêzên biyan de sazû ne û vê rewşa erîni keri xwe

meşandina tekoşinên hemberiyê de; hêzên li dijî diktatora Sedam bi girani xwe li hêllên Kurdistan'ê dispêrin. Li vê hêllê, her rêxistin bi tevger û amancên xwe tevgersaziyên pêk tine û li hember rejîmê şerên xwe didomi ne. Di rewş û dijarîya hoyên çile de, li hember rejîmê, tevger û tekoşin bê rawestandî tene domandinê. Hêzên hember rejîmê, her ro di weşin û radyoyên xwe de tevger û pêkanînen çekdarî diyar dikin. Û li ser hev her heftî bi hejmarek pirane tevger tene weşandinê. Ji van diyarkirina pê de her meh tevgerên pêk hatine diyar dibin. Ji weşin û diyariyên rêxistinêk ev yek diyar bûn:

- Di 2.1.1983an de pêşmergan nêzî gundê Babil'ê li rêya Dihok û

- Di 7.1.1983a pêşmergên şirîki yê refê PDK-Î û PSK-Î bi hevkarî li Kelekyasinaxa dijî dijmin kemînek vegirtin. Ereba dijmin hilweşandin. Yuzbaşî û berpirsiyarekê BAAS'ê hat kuştin. Şeva 20.1.1983a, pêşmergan li hêlla Suleymaniyê, dora Çarta erîşî ser merkeza polîs û alaya Talparêz'ê kirin. Gellek çekên giran hilweşandin. 5 esker kuştin. 6 esker birîndar bûn.

-Hêzeka şirîki ya pêşmergên PDK-Î û PK-Î ê erîşî birin ser hêza hêlla Karacem'ê ya eskerîya Hizawa. 53 ê eskerên dijmin kuştin. 34 esker birin bûn. Panzêrek û 3 cemsên eskerî hilweşandin û 5 qawîşên eskerî pejirandin. 24.1.1983an pêşmergan li cadda Mandêş û Dihok'ê hember dijmin kemîn



vegirtin. Cemsek eskerî kete kemînê. Subayek hat kuştin û 3 esker hêsir girtin. Gellek çekên dijmin hildan.

-Pêşmergan; di 15.2.1983an de, li gundek stratejîk gundê Kasrok, casûsek bidarvexistin. Û di 17.2.1983an de li rêya navbera Dihok-Mangeş'ê, hember dijmin kemîn danin. Panzer reviya bi êrişê pêşmergan cemse hatin hilweşandin. 7 esker hat kuştin û 5 esker birin bûn. Li hêlla Suleymaniyê navbera Kenar û Çawartê kemîn girtin. Di kemînê de êrişkirin ser cemsên esker û polisan. 5 polis hat kuştin. 11 kes birindar kirin. 15 esker kuştin. Cemsa hilweşandin. Li hember vê kemînê dijmin êrişî ser gundê Mikokîyan kir. Li vê bi îşkence û lédanan du welatî kuşt û yek birindar kir.

-Pêşmergên refa şirîki yên PK-Î û PDK-Î'ê avêtin ser Aqr'ê. Êrişî merkeza BAAS a faşîst, mala berpirsiyarê polis, yuzbaşî Abbas Xidir û êrişî mala subayê casûs kirin. Berberî dirêj domiya. Ji seet 22⁰⁰a berberî domiya. Li ber PTT ji ser caddê pêşmergan kemîn vegirtin. Panzêrek ket kemînê. Hemû kesên wê hat kuştinê. Di vê berberiya giran de pêşmergê PDK-Î Mam Şêx Ehmed-Suriçî şehit ket.

Evan bûyeran ji hin bûyerên nû hatine diyarkirinê ne. Li gohra weşin û diyarkirinên meha çile, bi hûr û girî gelleki tevger pêk hatin e. Ji 115an zêdetir esker hatin kuştin, 17 cemsên eskerî, 5 qawîş hilweşandin e. 9 subay û berpirsiyarê casûsî hatî kuştin. 7 esker hêsir ketin e, 7 caş hatî kuştin û gellek destikên çeka ketî dest. Caş ji yên ku têkiliyên wan bi rejîma Sedam re ye, û li hember hêzên dijî rejîmê û li dijî gel şer dikin ji wan re tê gotinê. Dişê li gohra daxûyana meha Sibat'ê, ji 20î zêdetir tevger pêk hatin e. 6 casûsên eskerî hatî hilweşandinê. 2 subay û 2 berpirsiyarên casûs, 6 caş, 50 esker û polis birindar bûne, 6 esker hêsir girtine û gellek destikên çekan hilgirtin e.

Ji ber ku bi hêza xwe ya dewletê rejîma Sedam li hember hêzên dijber xwe nagihe, bi pere û çekan di nav gel de hêzên milîs saz dike.

Ev tevger û pêkanînen yên çend rêxistinên ku li hember rejîma Sedam bikar hatin e. Ji van rêxistinên pêştir, gellek rêxistin û hêz li hember rejîma Sedam tevger datînin. Her ro tevger û pêkanîna bûyeran tê bihistinê. Rêya

vê yekê heye ku ber bi navînê ve li hember rejîma Sedam tevger pêşdetir bibin. Ku, "Cebha Wetan Demokratîk a Îraq" di belavoka xwe ya 16 ê Çile de daxûyan dike; wê "li hember rejîma Sedam, tekoşîna çekdari pêşdetir biçe" Di van hoyên dijwar de û bi cihengkirina hêzên Rojhelata-Navîn, ku tevgerên hêzên pêşverû cih li rejîma faşîst tengkirine û bi tekoşinên hundur xuyaye ku wê rejîma Sedam bi mehên havînê re bikeve rewşeka giran, teng û dijwar. Ku ji iro ve li hin hêllên gundî tesira rejîmê gellek kême. Rêya binketina rejîmê ji heye. Lê ji bo vê yekê, bi taybetî dibi ku, hêzên hember rejîmê li ser bersivêka şirîki li hev werin û piştgirtî û hevkarîyên hêza were cih. Lê hêzên hember rejîmê, ne wê hevkarî û piştgirtîya fireh pêk anîne û ne ji berberiyên hember hev rawestandî e. Ta ku her ro tevger û bûyerên berberiyên wana tene bihistinê. Ev rewş, ji bo hêzên hember rejîmê ra, rewşek nerînî ye. Û jariya hêllê hemberê rejîmê ev e. Ji bo hildana vê rewşa nerînî, xebatên ku pêk tên hê bersivên tekûz neanîne, negihandine dawiki.

Bi kurtebirî, daxûyana van yekan rast e ku; hêzên hundur û der, yên ku hember rejîmê ne, bi bersivêk şirîki li hev werin, yekîti û piştgirtî pêk binin. Di van rewşê erîni de hilweşandina rejîma Sedam mumkin e ta ku berberiyên navbera hêzên hemberê rejîmê dibine taybeteki ji domandina rejîma Sedam re. Ta yekîti û piştgirtîya hêzên dijî rejîmê pêk nê û li ser vê bingehê tekoşin pêşve neçî, hilweşandina rejîma Sedam di pêvajoyek nêz de ne hisan e. Hemû pîrsgirêk li hevkarî û yekîtiya hemû hêzan û li tekoşinê girêdayî mane.

Îro berpirsiyari û barekî giran xwe li hêzên pêşverû û weltahîzên Kurd û Ereban girti ye. Barek diroki li pêş wa ye. Bi daxwaz û hêviya pêkanîna ve berpirsiyariyê...

Bijî hevkarî û tekoşîna gelên
Rojhelata-Navîn împeryalizm û
paşverûkên hêllê!

15 ê Adarê 1983
A.C.

1 GULAN

ROJA tekoşin û berxwedana karker û kedkarên cihanê li karker û şervanên meydana, li şervanên zindan û çîyan pîroz be!

Cunta faşista qolonyalist li hember hemû mafên mirov û geli, bi zilm û zorbaziyên nedîtî şerê tunekirin û melisandina tekoşin û berxwedana karker û gelên Kurdistan û Tirkîyê bi dijwari didomine. Bi pêmayîna xwe ya dîroki li hember çîna karkeran, li diji kedkar û gelan êriş û zorbaziyên bi hemû destikên xwe yê nemirovî dimêşine. Vê di dema me de, gihandîye qeysa dij hişê mirovan.

Bêşik êriş û zorbaziyên burjuvayê Tirk, ji demên berê dijwartir li ser gelê me têyi meşandinê. Lewra; pêkanînen qolonyalîstî, karker û kedkarên gelê Kurdistan'ê gihandibû ber qeysa xwe-nebawerî û tunebûnê. Hemû taybetên gelê Kurdistan, bir û bawerî, xasiya berxwedanê, çand û taybetên netewî



kar û gelên bîndest derbikeve, di hoyên xwe yê dijwar de, bi pergalên hemdemî, xwedî li taybetên xwe yê netewî û civakî ji demediket. Li ser

koşina Serxwebûn û Azadiya Kurdistan û ji bo gihîştina dewran û dîroka hemdemî kom bû. Xwe di rêya hebûn û jîyan domandinê de bi tekoşin û berxwedanên bê emsal li ser milê karkeran rê girt. Taybetên gel û civakê li ser himên berxwedanê bi xwîn û fedekariyên giran ronahî bûn, geştir bûn û gelê Kurdistan'ê di rêberîya *Partiya Karkerên Kurdistan* de li hember qolonyalîsta Tirk, sazûmana nemirovî rawest. Hebûna xwe li ser taybetê hemdemî ava kir. Û qurna sazûmanên qolonyalîsta Tirk hejand. Himê rizgariyê bi eş û wundabûnên giran, li Kurdistan'ê vegirt. Bu hogirê dîroka hemdem.

Li ser pêmayînen şoreşgerî bi bawerîya şoreşê, bi xemla şoreşgerî ji bo pêşvebirina tekoşina serxwebûn û azadiyê, bi piştgirtina karker û gelên cihanê bi taybetên kedkarê cihanê gelê Kurdistan; û tekoşerên şoreşê li meydanên şer; li çîyan, li zindan û hêlên Kurdistan'ê, taybetên roja karkerên cihanê, di şer û berxwedanan de di kemilinin. Xwe pêşdarê şerê serxwebûnê dikin.

Bi amanca piştgirtina kedkarên cihanê federasyona me bi bir û bawerîya tekoşina Kurdistan'ê di sefên karker û kedkarên Swêd'ê, xwe pêşdarê meşa Yekê Gulan'ê kir. Bi hevkarî û piştgirtîya karkerên Swêd; karker û kedkarên koçberê welatan, bi deng û hevkarîya hêzanan li meydanan meşîyan.



û civakî pejandî bû. Netewbûna xwe li serê vedigirtîya. Û bi vê amancê bi abûrî, siyasî, civakî, çandî û hwd. Kurdistan'ê dipejirand. Di gellek hêllan de amancê xwe yê nemirovî pêkanî bû. Li ser taybetên welatî û geli bi zerpên dijwar, bi pêkanînen qolonyalîsta kevnare di rêya tunekirinê de gelê Kurdistan, diherikande dîrîya dîrok û hemdemê. Bi van hoyên dijwar de, bi rewşa civaka qels, taybet û rojên ked-

bingehê hemdemî taybetê mirovaya xwe bi her qeysî nediparêst. Taqeta parastina taybetên civak û netewî berçav nedibûya. Û li hember wî dijminê dijwar, xwe bi pergalên hemdemî nedixemland.

Salên '70yan, ji gel û kedkarên Kurdistan'ê re bûn destpêka pêvajoka nûh, û rêyeka nûh vebû. Bi vekirina vê pêvajoka nûh li rêya hebûna gelê Kurdistan li hawîrdorên Berxwedana Te-

*** BÎJÎ YEKÊ GULANÊ!**

*** BÎJÎ TEKOŞINA SERXWEBÛNA KURDÎSTAN!**

*** BÎMRE EMPERYALÎZM Û CUNTA FAŞÎSTA QOLONYALÎST!**

BIJÎ 1 Ê GULAN'Ê!



**Bimre Emperyalîzm, Kedxwarî û Paşverûtî!
Bijî Serxwebûn û Îternasyonalîya Proletarya!
Bijî Proletarya û Tekoşîna Berxwedana Şoreşgerî ya Gelê Kurdistan!**